

Führerên
KT'ê pirr in;
Almanya
li Fuhrerekî
digere

Nihat Dirêj

Rûpel 12



Çapemeniya Tirk: Berdevka fasîzmê

• Çapemeniya Tirk roj bi roj ji nirxên mirovahiyê û ji rûmeta çapemeniyê dûr dikeve. Ji xeynî rojnameya Gündem'ê, Aydinlik'ê û çend muxabîren rojnameyên din jî ne tê de, hemû muxabîr, nivîskar û berpirsiyarên rojnameyên rojane û kanalên televizyonê ji berdevkiya generalan pêştir tiştekî din nakin. Çapemenî bi nivîs û nûçeyên xwe, ronahîkirina raya giştî li aliyekî, mejiyê mirovan li hev dixe û bi metodên psîkolojik rê li ber pêşveçûnên tevgerên azadî û demokrasiyê digire û ji rayedarên dewletê zêdetir, dewletê ji dil û can diparêze.

• Rojname û TV'ên Tirk bi taybetî dijminiya xwe ya li hember gelê Kurd her diçe zêdetir dîkin da ku bikevin çavêن general û dewlemendant, ji wan xelatan bistînin. Di şuna ku muxabîran bişînin Kurdistanê û li wir rastiya bûyeran hîn bibin û binivîsin, di navendên xwe de agahiyêni ser Kurdistanê ji MÎT û berpirsiyarên leşkerî distînin û li gor dile wan dînivîsin. Ji brîfînga ku meha çûyi Serleşkerê Artêşa Tirk Doğan Güreş da çapemeniyê û vir ve çapemeniyê hîn dostaniya xwe bi serdestan re, dijberiya xwe jî li hember gelê Kurd zêdetir kir.

Rûpel 8



Berpirsiyarên çapemeniya Tirk ji xeynî berdevkiya rayedarên dewleta Tirk a dagirker, gelek caran di kokteylênu ku ji aliyê dewlemendant ve têne terfiplirin de têne cem hev û li ser planênu xurtkirina Artêşa Tirk û vêmirandina tevgerên demokrasiyê azadiyê diştexilin. Di wêneyê jor de ji berpirsiyarên çapemeniya Tirk Altan Öymen, Günerî Civaoğlu û Emin Çölaşan xuya dîkin.

Wê cezayê xayîn û sîxûran bibe cezayê ‘Sînmar’

Weke em dizanin tu caran dîrok, kesê xayîn û cehş efû na-ke, li wan nabore, an hêzên serdest û paşverû wan dikuje, piştî ku karê xwe bi wan diqe-dîne, an ji hêzên gelêrî bi xwe wan ji holê radike. Nimûneyê vê yekê zehf in, hem di diroka me de û hem ji di diroka gelên Rojhilata Navîn de.

Em niha dixwazin nimûneyî, ji diroka Ereban bînîn zi-man: Dibêjin di dema berî ku îslam di nav Ereban de derke-ve, ango di salên 500-600 piştî Mîlada İsa, mîrekî Zerdeş û zâlim û girêdayî bi Roma ve, di nav Ereban de he-bûye. Navê wî Nuemanê kurê (mae el sema) ango kurê ava-ziman, wî li Hîrayê di nav-bera Şamê û Bexdayê de hu-kim dikir û împaratorê Roma piştî wî digirt, zora xwe wî li ser hemû eşîrê Ereban dikir.

Vî şahê hey zalim xwest qesrekê (avahiyekê) ji xwe re ava bike, ji xwe re got, ezê qesreke wisa ava bikim ku wek wê li cîhanê tune be. Rabû çavê xwe li hostayekî baş-gerand, lê ci hostayê hebûn xwe ji ber vediartin, nedix-westin xizmeta wî bikin ji ber zora wî û zilmâ wî.

Belê ew rabû deng bi dinê xist û got kesê bê qesra min ava bike ezê wî ji zêr û zibe-ran tîjî bikim.

Sînmar hostayekî jêhatî bû, gava bihîst ji bo malê dînyayê rabû berê xwe da Nueman. Jê re got: “Ez qesra te ava bi-kim ku wek wê li cîhanê tune be, lê tu ji zêr û ziberan bide min.”

Nueman Qral qebûl kir, Sînmar ji rabû dest bi cêkirina qesrê kir û ava kir. Lê qesr gelekî xweşik û delal bû.

Gava Nueman bihîst ku qesra wî ava bû, rabû wezîrê xwe û xizmetkarê xwe bi xwe re rakir. Banî hostayê xwe Sînmar ji kir. Berê xwe dan serê qesrê cihê bilind, gava gi-han serê qesrê Nueman gote hostayê xwe: “De ka hostayê min û hêja bibêje, ka qesra min ci wesfê wê hene?”

Sînmar: “Qralê min qesra te geleki xweş e, weke wê nîn e, lê belê, kêmasiyeye wê he-ye kes nizane ji min pê ve.”

Nueman: “Ka bibêje ew kemasî ci ye?”

Sînmar: “Qralê min û hêja di bin vî ruknê qesrê de ango dibin vê enîşka wê de kevireki mezin heye. Gava ew kevir bê-kişandin wê qesir hemû bihe-rife û bê xwar.”

Nueman: “Kes ji te pê ve vî tişti nizane, ma ne wa ye?”

Sînmar: “Belê mîrê min..”

Nueman: “Ka çavê xwe bi-gire hosta Sînmar.”

Hosta Sînmar çavê xwe girt û Qral Nueman dahfek dayê, ji serê qesrê Sînmar ha-te xwar. Heta giha binê qesrê bû deh parce.

Ji ber vê sedemê, gava yek cezayê wî giran be, di nav E-reban de dibêjin, “Ew hat ce-zakirin bi cezayê Sînmar.”

Gelo niha cezayê van xayînên me, yên ku xizmeta kedxwaran dikin ne heq e wek cezayê Sînmar be?

Bi rastî li ber wan Sînmar tiştek nekiriye, çunki Sînmar qesrek ji yekî zâlim re ava kir, lê belê xayînên me îro dixwazin weletekî û mîletekî bifiroşin zordestan. Ji ber wê yekê gerek cezayê wan ji yê Sînmar girantir be.

Hüseyîn Şawîs

Mizgîn

Keçê bi dijber i, ku têyî helan xweş dîlber i Mizgîn
Gerîla yî, hozan i, lew gul i ser dil her dem Xencer i Mizgîn,
Şervan i li serê çiyan, dest bi tifing,
Gul û reyhan i Mizgîn
Kozek agir i, li ser dil tu, şûr i, li ser milan i Mizgîn.
Dest tenbûr i, bangvan i li holan ji gel re şivan i Mizgîn
Li ser cih û nivînên kevir bêxwev i
Dil berek dilovan i Mizgîn
Dilovan i Mizgîn.
Bi mirin tinaz i, xemkuj i, îro, lew tu cengvan i Mizgîn
Ku bimirî şehîd i keçik, bimînî li ceger û dil Mîvan i Mizgîn.
Sifetên sor, gul-gul vedibin gelperest i tu, Nesla şeran i Mizgîn.
Car li bergehîn aştiyê, car li çiyan rizgarvan i Mizgîn.
Gerîlayên welatê bindest i, hozan i, helbestvan i Mizgîn
Bêmirinî ey keçik, di riya şoreşê de, lew tolevan i Mizgîn
Artêş i, li ber top û tifing, gernasê girsey i Dadevanî Mizgîn
Tetwan ji bo te mîhrîcan dike, da ku tu Destan i, Mizgîn.
Zulmet li hember te çarmedor şax e, çiûk i li Daristan i Mizgîn
Qedexe kirine li te gulistan, lew gulek ber Tirpan i, Mizgîn.
Giyanfidayî tu, ji bo aştî û biratî, rizgarperest i Her dem ferman i Mizgîn
Şehîda riya rast i, Zaho ye bi vê beytê, te Bîr anî, Mizgîn

Zaxoyê Dilxirab/ Agirî

Ew dem bihûrî

Di 18'ê meha 7'an sala 1993'yan de saet li 16.00'an şeveke alîkariya Navenda Çanda Mezopotamyayê hate amadekirin, bi rîberiya Yekîtiya Hunermendêن Welat-parêzên Kurdistanê ve.

Bi dostekî Alman kovarvanekî cîgâyî (mehelî) em di şevê de besar bûn. Bi toneke zelal, hêja û tertîb, cejinşanê dest pê kir. Ji eşiq û meraqa muzîk û hozanên dengbêj, berpiştên (hêt, qalçê) me li ser kursî hişk bûn û çavê dostê min ji hevalen HUNER-KOM'ê nehate guhertin, dem hat kulîk û zarokên Kurdistanê wek fîriştan (melaikan) li dor hev geriyan, mamoşteyê wan pirr şanaza û jîr bû, wî zanîbû çawa zarakan fêrî hel-bestên liv û sanayî (hêsan) bi-ke. Bernameyê dest pê kir, zarok vir de wê de bi rîexisti-neke sergerm û bi dengekî ez-manî helbestên xwe pêşkêşî danişvanan kirin. Gav bi gav min ji dostê xwe re şor (pey) û livêñ wan werdigerand Almanî û wî ji serî dihejand. Lê min zanîbû ku xwîn di eniya wî de dikele û pirr şor li vir hene dixwaze di cih de ji min re bibêje. Berê wî digot: “Par-tiyên Kurdan gişt rînd in, bili PKK'ê. PKK pirr sert e û îm-kan tune ye ku bigihîje ar-mancekê.”

Kulîkîn Kurd bermameyên xwe bi seyr (balkêş), berde-wam kirin. Têlén tembûrê di-kin jinginî wek çawa mirov re-heke dilekî bikişîne, wilo di ber muzîkê de xwestinê xwe diyar kirin. Xwestin ku ew ji

FERHENGOK

Başok: Celebekî teyran (şahîn, falcon)

Baz: Celebekî teyran (doğan, atmaca)

Berfin: Celebekî kulîkân

Beşîşîn: Beşîşîn (gülümsemek)

Bandev: Sergir, navber, lütke (doruk, zirve)

Beybûn: Celebekî kulîkân (papatya)

Bineş: Celebekî kulîkân (menekşe)

Bintûfi: Yekcar, teqez, mitleq

Biwêj: İdyom (deyim)

Cihderk: Jêderk, çavkanî, jêza (kaynak)

Çerqizîn: (burkumak)

Demikandin: Rengavétina kin-can (soldurmak)

Demikin: Rengavétin (solmak)

Demîn: Adaptasyon, hînbûn, hobûn (alışma)

Eylo: Hîlo, qertel

Ferqizandin: Pekandin (fırlat-mak)

Ferqizin: Pekin (fırlamak)

Hawîrparêz: Kesê xwezayê diparêze (çevreci)

Li yekî negirtin: Li yekî bihûrîn, efûkirin

Li min negire: Li min bibihure

Nêrgiz: Celebekî kulîkân (ner-giz)

Nîveng: Navend, orte, merkez

Peytandin: Tesbitkirin

Pışav: Asîmîle

Pışavtin: Asîmîlekirin

Pivang: Pîvok

Rewrewk: Leylan, serab

Rihan: Celebekî kulîkân (rey-han)

Sorsork: Celebekî kulîkân, bûkîk (gelincik)

Sosin: Celebekî kulîkân (pas-lalesi)

Rêzname: Nîzamname (tüzük)

Şêwr: Civîn, sohbet, danişn

Tebab: Mîktar

Teva: Tişt

Tika: Rica

Xenak: Fetisok (boğucu)

Zende: Ebret (ibret)

serxwebûna Kurd û Kurdistanê cangorî bûma. Heval Nasro! Ola we, êla we, xwarin û vexwarina we, rabûn û rûniştina we azadiya gel û gelan e. Şeva te bimîne xweş.”

“Nehru ji bo serxwebûna Hindê ketibû hebsê: Li pişt zincir û hesinan, bi bêhnxweşa bihara 1925'an şane bû, di girtigehê de nûcê gîhîste wî ku xwînmij û barbarê gelan Mustafa Kemal bi hovîti gelé Kurd qir û wêran dike, gund û bajarên Kurd dişewitîne. Wê demê Nehru got: Niha Ataturk çîçek û binevşen biharê bi xwîna gelê Kurd av dide, lê bila were zanîn ku gelê Kurd nayê qelandin û helandin ta xwîn di gewdye wan de hebe. Gelekî wekî gelê Kurd ku her gav ji bo azadî û serxwebûna xwe amade ye xwînê bîrijîne, îmkan tune ku winda bibe. Muheqeq ev gel kîjan roj be wê bi ser bikeve.”

Cotkar

Nûçeyên cengê

- Tevgerên terorî yêni ku ji aliyê cerdevan ve pêk têr bêhtir dîbin. Heta niha gundêni ku ji aliyê hêzêni dewletê ve dihatin şewitandin, êdî cerdevan jî di vê kirina dewletê de jê re dîbin hevkar; digirin ser gundan, wan dişewitînin û qetîaman pêk tînin. Ev heftê gelek gund bi pişgiriya cerdevan ji aliyê hêzêni dewletê ve hatin şewitandin û valakirin.
- Çapemeniya Tirkîyê bi yek dengekî weşanê dike çav û guhêni xwe ji van bûyeren dijî mirovahiyê ku li Kurdistanê diqewimin re girtine û li gor sansûra ku hêzêni leşkeri yêni Tirkîyê danîne ser çapemeniyê, tiştekî nanivîsin. Wezîre Karê Hundîrin ê Tirkîyê Mehmet Gazioğlu jî, bi gotina xwe ya "Gel bi dilê xwe ji gundêni xwe bar dike, kesî wan bi darê zorê ji gundêni wan dermexistiye" diyar dibe ku hikûmet di dîtina xwe ya der barê pirsa Kurdî de li ser ci rîcê ye.
- Livbaziyan li hember hêzêni dewletê li çar aliyê Kurdistanê didomin. Di operasyonêni dewletêni yêni li hêla çiyayê Tendûrekê de helikoptereke Kobra ji aliyê gerîla ve hate daxistin.

Navenda Nûçeyan-

24 Tîrmeh 1993: Hêzêni dewletê ji aliyê, cerdevan ji aliyê din diavêjin ser gundan. Tevî dişewitînin û talan dikin, qetîaman pêk tînin. Bi vî awayî cerdevanen gundê Boşatê avêtin ser gundê Çiçika ku li ser navçeya Farqîne ya Amedê ye û 3 kesî dan ber gulleyan, 60 mal û 2 hezar domim zevî şewitandin. Dû re jî avêtin ser gundê Şevlera, 5 mal jî li vî gundi şewitandin.

Piştî 9 gundê Licê ku hêzêni dewletê ew şewitandin, ev car jî li gundê Dêrxûsê, Cînezûr, Çemê Elîkan û Darakol gundiyan li nava gundan civandin û li wan tade kirin. Li Mêrdînê jî cerdevanen gundê Dêrikahesêuso ku li ser navçeya Qoserê (Kiziltepe) ne û cendirmeyen qereqola gundê "Bektaşî" bi hev re zordestiyê li ser gundê Dîkmenê dikin ku, ji gundê xwe koç bikin. Gundê Zêvîkê ku li ser Mêrdînê ye, ji ber zordestiyâ hêzêni dewletê vala bû.

Cerdevanen gundê Hecîkesan û Evdika ku li ser navçeya Hezaxa (İdîl) Şîrmexê ye, li gundiyan gundê Delavêkesrê tade dikin ji bo koç bikin.

25 Tîrmeh 1993: Gerîlayen ARGK'ê 4 tûristên Fransî revandin. Berî bi demekê 2 tûristen Îngîlîz jî, ji aliyê gerîla ve habibûne revandin. Li gor beyana Qumandariya Eyaleta Xerzan, ji bo ewlekariya tûristan her tîst hattîye kirin. Ji bo berdana tûristan jî, heta niha tu kes bu wan re neketiye têkiliyê. Piştî vê beyana Serleskeriya Xerzan Sekreterê Yekemîn ê Balyozxaneya Fransayê de 26'ê Tîrmehê de çû Wanê da ku bi rêvebirîn herêmê re ji bo berdana tûristan bikeve têkiliyê.

Di şerê nav gerîla û hêzêni dewletê de li hêla gundê Xarê, "Beytekîn" û Midûrê ku li ser navçeya Şîrvana Sêrtê ne, 2 leşker, 2 cerdevan û 3 gerîla hatin kuştin. Piştî şer hêzêni dewletê gundê "Beytekîn" vala kirin.

Gerîla avête ser Qereqola Çatak a ku li ser navçeya Navşanê (Şemdinli) ya Cûlemêrgê ye. Leşkerek û 3 gerîla hatin kuştin. Ji alyê din ve gerîla nijdek bir ser

gundê Çatakê û 3 cerdevan kuştin.

Di sefera nav Tûx (Tetwan) û Mazrayê (Elezîz) de trênek di ser mayînê de derbas bû û qelibî. 2 leşker mirin, 2 jî birîndar bûn.

Gerîla cerdi ser 2 gundê Sasonê yêni cerdevanîn kirin. Bi roketavêjan gundê Cacas û Bozikan rûxandin, 5 cerdevan revandin û çekên ên mayî jî ji wan standin.

Li aliyê din cerdevanîn girtin ser gundê Gisgisê ku li ser Erxenê ye û gundê Helhelê ku li ser Hezroyê ye. Tade li gundiyan kirin, zeviyê titûnan şewitandin, hin gundiyan jî bi xwe re birin û teslimî qereqolê kirin.

Cinayetên "kiryar-nedîyar" (failî meçhûl) di van rojîn dawî de zêde bûn. Di nav du rojan de li Kurdistanê 9 kes bi vî awayî hatin kuştin. Li Sêwêregê Mehmet, Ahmet, Ebubekir Suarı û Izettin Deßen, li Amedê Sedat Çelik û Abdullah Sapan hatin kuştin. Li Farqînê jî, bi vî cureyi Mehmet Erze û Isa Bozan hatin kuştin.

26-Tîrmeh 1993: Komeke gerîla ya ku ji heftê (70) kesan pêk dihat, cerdi ser Qereqola Tîsî ku li ser navçeya Navşanê ye kirin. Di cerde de 25 leşker û 3 gerîla hatin kuştin.

Piştî şerî de 23'yê Tîrmehê de di nav gerîla û hêzêni dewletê de li gundê Beytan ku li ser Sêrtê ye, pêk hatibû û tevî 17 gerîla, 2 leşker, serbazek û 2 cerdevan hatibûn kuştin; dewletê bombekirina gundêni herêmê xurttir kir. Di vê bombebaranê de malen gundê Şûşan, Herbelüt, Serşekftan, Taşix, Murucu û Beyterûn hatin şewitandin, gundî koçemalîlî gundêder û dor belav bûn.

Li hêla gundê "Üzümlü" ku li ser Cûlemêrgê ye gerîla û cerdevanîn li hev xistin, 3 cerdevan hatin kuştin. Piştî re dewletê li wê herêmê dest bi operasyonê kir, di operasyonê de 3 leşker hatin kuştin.

27-Tîrmeh 1993: Gerîla balefirek û firokeyek daxistin. Li Agirî, li hêla çiyayê Tendûrekê şerî de navbera gerîla û hêzêni dewletê de bi pirranî li devera Gerêqûlê û Şikeftanêriyan geş bû û di vî şerî de gerîla firokeyek

Kobra û balefirek F-16 daxistin.

Li Cûlemêrgê gerîla avête ser Qereqola "Kisikli" ku li ser navçeya Geverê (Yüksekova) ye, serbazek, 4 leşker û 7 jî gerîla hatin kuştin.

Li hêla Bismilê gerîla cerdi bir ser stasyona pompekirina petrolê ya NATO'ye kir, çekên notirvanan (bekçî) ji wan standin û çün.

28-Tîrmeh 1993: Li Sason, Amed, Cûlemêrgê û Agirîye tevî hev 76 cerdevan istifâ kirin. Gerîla girt ser gundê 'Çata' û 'Ali-paşa' yêni Agirîye. Li ser istifanekirina cerdevanîn şerek qewimî, 3 cerdevan hatin kuştin. Li ser vê bûyerê 58 cerdevan û 5 gundan istifâ kirin. Ji gundê Ziyarek a Erxenê 9 cerdevan, 4 cerdevan ji navçeya Çalê, ji Sasonê jî 5 cerdevan dev ji caşhîtiyê berdan.

Li Misircê A. Kerîm Anîl ji alyê "kesen nedîyar" ve hate kuştin.

Bi êrişâ gerîla ya li ser navçeya Agirî, Bazid û Hamûrê avahîyen dewletê zirareke mezin dîtin. Avahîyen Miduriya Emniyetê, leşkeriyê, "Köy Hizmetleri", bi êrişen roketavêjan xesirin.

Li İdirê jî, avahîyen Miduriya Trafikê, Qereqola Polîsan bi roketen gerîla hatin rûxandin. Her wiha trafoya elektrîkê jî, ji êrişâ gerîla para xwe stand û teqîya. Zîrar mezin e.

Sazîyen fermî yêni Bilîsê bûn hedefê roketen gerîla. Piştî livbaziya gerîla hêzêni dewletê bêhedef gulle li navenda bajîr reşandin, 2 kes birîndar bûn.

Di operasyonê li hêla çiyayê Tendûrekê de leşkerek mir, serbazek û 9 leşker birîndar bûn. Qumandarî Herêma Duyemîn ya Eyaleta Serhedê daxuyand ku di operasyonê çiyayê Tendûrekê de heta niha 7 gerîla hatine kuştin.

29-Tîrmeh 1993: Li Mêrdînê gundê Kalendera ku li ser navçeya Rîşmilê (Yeşilli) ye, cerdevanen gundê Bekere, gundiyan li meydana gundî civandin û tahde li wan kirin. Gundiyan diyar kir ku ev cerdevan eşyayen xelkê yêni giranbuha ji wan standine, milê muxtarê gundî şikandine û 2 hezar marken wî jê standine.

HAWAR

Dillibixwîn

Trêna Çîllerê

G erê dest pê kir. Ji Tansu Çîller û ber bi jêr ve, hikûmeta koalisyonê çû Kurdistanê. Li kéléka wan komek mehmetçikên ku li şûna çekan pêñûs hilgirtibûn, hebûn. Tûrê xwe ji kaxezên rojname û kamereyan dagirtibûn. Her kesî ji Tosinê re dida lotikan. Li ser bextê hinekan belkî dilê çend nivîskarê koşeyan ketibe kenê Çîllerê jî.

Gotineke pêşîyan heye: "Ê wan çandî ce bû, ew jî ne bû". Bav û kalêni me rast gotine. Gera trêna Tosinê jî wi-sa bû. Reklam û propagandayêni ku berî gerê, belav kiri-bûn, vala derketin. Xeyala wan ev bû; bêgotûbêj, Kurd li "dijî terora" PKK'ê ne. Kuştinê ji hêla PKK'ê ve, gel qebûl nake. Her kes PKK'ê weke rîxistîneke terorîst dibîne. Kurd Tirkîyê welatê xwe dibînin... Ji ber van egeran wê bi milyonan gelê Kurd bi gul û çîçekan were pêşîya Çîllerê... Erê bavo, ji xwe çavêni gel li ser riya "xatûnê" westiyabûn. Lê, nebû.

Cûyîna Çîllerê û mitînga ku mehmetçikên li pişt maseyan qala wê dikin, ci rastî anî ziman?

Gelê Kurd gelê PKK'ê ye. Lîste ya rîxistînê ku ji hêla USA'ye ve terorîst têne dîtin, nikare gel û kesen ku gel diparêzin bitirsîne. Di tunebûnê de gel xwedî li partiya xwe derketiye, di hebûnê de jî neçar e wê xwedî lê derkeve. Pirs ne pirsa xercirîna çend milyon

û trîyonan e, doz doza azadiya geleki û serxwebûna weletekî ye. Bi vê armancê gelê Kurd meşê didomîne. Ew pereyêni ku Tansu qala wan dike, tu caran bala gel nakişînin ser xwe.

Ez matmayî dimînim, wê çîma serokwezîreke Tirkan li weletekî weke Kurdistanê bi trîyonan mesref bike? Tevî ku tu nemaye ew di bin deynan de bifetisin. Pirr ji me hez dikin, dilê wan bi Kurdan dişewite, dixwazin weke yêni li Bosnayê zikê me jî tije nan û pîvaz bikin...

Pirr ji me hez dikin, dilê wan bi Kurdan dişewite, dixwazin weke yêni li Bosnayê zikê me jî tije nan û pîvaz bikin... Eger hûn dixwazin perdeyê ji ser rûyê wan hilîn, werin van hevokên nivîskarê Hürriyetê Ertugrul Özök bixwînin: "Hûn pereyê kê diavêjin sikakan? (Ji Çîllerê re) Eger hûn terora PKK nedîn sekinandin û sozê ku we daye me pêk neynin hûn wan pereyân diavêjine sikakan. Ew pereyê kê ne?..."

Kes naçe pêşîya Çîllerê. Wê çîma biçin?! Wê jî weke yêni berî xwe, tiştekî nû bi xwe re neaniye.

Rast e, ciwanekî me şehîd dike bi dehhezaran gîrsên gel, bi cendekê wî re dimeşin. Jin dîlînîn, xort sozê hilgirtina çekan didin û zarok sîngêni xwe vedîkin, keviran hildigirin û li pêşîya tanqan diçin û têr... Li welatê me mitîng wisa çedîbin. Eger rojnamevanen Tirkan bi hatina çend sed cerdevan, polîs, tîm û karmendêni dewletê kîfa xwe xweş dikin û dibêjin qiyamet rabû, ew tiştekî din e. Xwe dixapînîn.

Tiştekî din bala min kişande ser xwe. Tosinê di axaftina xwe de çend gotinêni jinan jî anîne ziman, gotinê wiha nermik: "Ez weke xwişka we me, diya we me..." Reaksiyona gelek kesan li hemberî vê femînîzma Çîllerê hişk bû.

Li vegerê ji bo gelê Amedê Tansu axaftinek çêkir. Ji tîrsa gerîla lingêni wê dilerizîn, desten wê diricifin. Rihê xwe xiste devê xwe û got: "Bila di serî de min bikujin" bawer bikin ji dil nedigot.

Bi vî awayî xatûna Tirkan weke çû wisa hat.. Bawer nakim careke din bi wê moralê here.

Îsraîl li Lubnana Başûr bombeyan dîbarîne

Di rojêni dawî yên meha Tîrmehê de Îsraîl dîsa girte ser Lubnana Başûr, Artêşa Îsraîl bi rojan bi balefirân bombe reşandin ser kampen gerîla yên Filistinî û yên Rêxistina Hizbulâh. Di van êrîşen hovane de êdî zehf kesen sivîl zerar dîtin, zehfên wan jin û zarok nêzîkî sed kes hatin qetilkirin. Penaberên Filistinî ku li Lubnana Başûr cihwar bûne, ji ber êrîşen Îsraîl dev ji malen xwe berdan û careke din koçber bûn.

Nûçeyen Derve- Artêşa Îsraîl li ser Lubnana Başûr bêrawestin bombeyan dîbarîne û gelek never û gundê Lubnanê dide ber top û fuzeyan. Di van êrîşan de zêdeyî 50 kesen sivîl hatin kuştin û gelek gund hatin wêrankirin. Ji ber êrîşen Îsraîl her roj bi deh hezaran kes ji Lubnana Başûr koçberî devêrin din dibin.

Ji roja 26'ê Tîrmehê ve Artêşa Îsraîl êrîşen xwe yên li ser Lubnana Başûr ku gelek kamp û wargehîn Rêxistina Hizbulâh û gerîlayen Filistinî lê hene, her tim zêde û tund dike. Di van êrîşen ku bi balefir, top, fuze û bombeyan têr pêkanîn de, zehfîn wan zarok û jinê sivîl nêzîkî sed kes hatin kuştin. Ji ber van êrîşen hovane di navçend rojan de nêzîkî 200 hezar kesî dev ji warêni xwe berdan û koçber bûn.

Li ser êrîşen Îsraîl Liderê Rêxistina Hizbulâhê Hasan Nasrallah da diyarkirin ku, Serokwezîre Îsraîl Izak Rabîn li pey vemirandina berxwedana îlamî ye. Nasrallah ev armanca Rabîn wek tiştekî, xeyalî nirxand û gote ku ev êrîşen Îsraîl bêber-siv namînin, wê hesabê wan di demeke pîr nêzîk de ji Îsraîl bê pîrsin.

Li gor nûçeyen ajansên biyanî, Artêşa Îsraîl êrîşen xwe êdî zehf li herêmén Sûr, Nebatiye û El-Tuffah tund dike. Li van herêmén navêni wan li jor derbas dibin, gelek gund û navce bêrawestin ji aliyê balefirên Îsraîl ve têr bombe-barankirin û her roj bi dehan zarok û jin di bin van êrîşan de têr qetilkirin. Li ser qetilkirina kesen sivîl Komîteya Xaça Sor ya Navneteweyî li Cenevrê bi daxuyaniyekê hemû aliyen ku dibin sebeba kuştina sivîlan



Ji ber êrîşen Îsraîl yên ku êdî zehf zerarê didin gelê sivîl, her bi deh hezaran kes ji Lubnana Başûr ber bi Bêrûdê ve bi herikîn koç dikin

protesto kir û ew dawetî rawestandina êrîşen li hember kesen sivîl kirin.

Li aliyê din Serokê DYD Clinton di daxuyaniyên xwe de dilxweziya xwe ji bo êrîşen Îsraîl da diyarkirin, ji ber vê yekê Clinton pesnê tewra Sûriyê ji da ji ber ku Sûriyê li hember êrîşen Îsraîl dengê xwe dernexist û pasif ma.

Wekî din Wezîrê Karê Derveyî yê DYD Warren

Christopher, ji ber tevliheviya Lubnanê, gera xwe ya ku hefteya çûyi li Asya û Rojhilata Navîn dabû destpêkirin, di nîvî de hişt û vegeeria Washington. Clinton da xuyan ku Amerika bi baldarî bûyerên li Lubnanê takîb dike.

Li ser qetîfamên ku Îsraîl li Lubnanê pêk tîne, serokê demsalî yê Konseya Ewlekarî ya Neteweyen Yekbûyî û nûnerê daimê yê Ingilîstanê Sir David

Hannay da zañîn ku Lubnan dev ji daxwaza lidarxistina civîna ku berê talep kiribû, berda. David Hannay gote ku hemû endamên Konseya Ewlekarî xwedî hemdîtin in ku pêvajoya mayîna Hêza Aştiyê ya YN'ê li Lubnanê şes mehîn din bê dirêjkirin. Weke tê zañîn ji sala 1978'an ve ev hêza bi navê UNİFIL ku ji 5 hezar û 250 kesan pêk hatiye li Lubnanê wezîfê dike.



Qral Huseyîn û Yaser Arafat ku bi salan dijberiya hev dikirin, niha li ser plana konfederasyoneke di navbera Urdun û Filistinî de dixebeitin.

Nûçeyen Derve- Rêxistina Rizgariya Filistinî (RRF) û Urdun dixwazin pişti bi destxistina cihen ji aliyê Îsraîl ve dagirkirî, konfederasyonê avâ bikin.

Arafat û Qral Huseyîn li dû dijberiya salan ber bi hev diçin û dixwazin di navbera gelên xwe de têkiliyên xurt pêk bînîn. Vê mehî ji bo têkiliyên Amman û cihen dagîrbûyî (West Bank û Herêma Gaza) bi rê ve bibin. 6 komîte hatin avakirin.

Balyoz Filistinê yê li Urdun got: "Em ji bo vî karî dereng man, tê zañîn ku em bê Urdun, Urdun ji bê me nabe." Serokê RRF'ê û Dewleta Filistin Yaser Arafat ji cara yekemîn pişti pey-



Urdun û Filistin li pey konfederasyonê ne

ya Yekbûyî ya Ereban" be. Di vê planê de rêvebirina karê hundiîn û parlamenta bi serê xwe û di ser wan re ji hikûmeta Federalî û parlamentoa federalî cih digire.

Kesen li ser politikaya Rojhilata Navîn pispor in dibêjin ku, ew plan dê piştgiriya Îsraîl û DYD'ye ji bistîne, ji ber ku, ew plan daxwaza serxwebûnê ji bo Filistinê ji holê radike.

Li aliyê din hinek gelemse ji li pêşberî vê planê hene. Cihê Filistinîyên penaber, li derveyî warêni dagîrbûyî, di vê planê de ne kifş e. Ji lew re gelek mi-

rovêni Filistinî konfederasyonê naxwazin. Penaberekî Filistinî daxwaza xwe wiha diyar dikir: "Em serxwebûnê dixwazin, ji wê këmtir em tu tişti napecjîrinin."

Ew plan nîstecihêni East Bankê yên Urdunê ji ditîrsîne. Ji ber ku piştî konfederasyonê dê ewê dakevin hindikayî û hêza di destê xwe de winda bikin. Lewma wezîrê agahdariyê (informasyon) yê. Urdunê got ku, "Ew tiş bi dilxwaziya herdu gelan çedibe, bi daxwaza partîyan nabe. Lê ew tiş, nayê wateya ku em dê vê planê guftûgo ne-

kin, têliya xwe bi hev re zexim nekin."

Niha, heyetêni Urdun û Filistinê di Civînê Aştiyê de tev cih digirin. Nûneran da xuyan ku, ew dê tu planêni ji bo pêşeroye bi Îsraîl re imze nekin, heta pêşveçûyînê berbiçav di navbera Îsraîl û Filistin de çenebin.

Pêkhatina vê planê girêhiyê encama Civînê Aştiyê ye. Ji ber ku, tiştekî wisa inçex li piştî rizgarbuna cihê dagirkirî kare çebibe, tu danezanê fermî ji aliyê wan dewletan ve nehatîne weşandin.

Gerîlayen Perûye bombe avêtin Balyozxaneya Amerîkayê

Nûçeyen Derve- Di 27'ê Tîrmeha 1993'yan de li paytexta Perûye Lîmâyê gerîla bombe avêtin Balyozxaneya Dewleten Yekbûyî yên Amerîka (DYD). Piştî teqîna bombe avêtin 4 kes ji zehfîn wan polis û leşker birîndar bûn. Li gorî vegotinê polisan, zirarek mezin gihiştiye avahiyê.

Berdevkêni DYD'ye yên fermî (resmî) ew agahî teyîd kirin (rastandin) û gotin ku, tu kesen Amerîkî zirar nedîtiye, bi tenê çend cam şikestine, agir ku bi avahiyê ketiye bi hêsanî hatiye tefandin. Lê Offîsa Polisan a

Navendî ya Perû da xuyan ku, ew bombe li kamyonetekê barkiribûye û 30 mîtro dûrî balyozxaneyê, li ser riya navendî bûye. Bi teqîna bombe re mirovîku bi erebeya xwe di wir de derbas dibe dimire û tevî polis û leşkeran 4 kes ji birîndar dibin. Agir bi 3 qatêna avahiyê dikeve û zirarek daringî ya mezin çedibe. Dîsa eyî çavkaniyan gotin ku; tu grûban ev bûyer hilnegirt ser xwe. Şûn ve li dereke nêzîkî ku ev bûyer pêk hat, di nav polis û gerîlayan de şer derket gerîlayek hate girtin.



Serleskerê Artêsa Tirk Doğan Güreş, di dema teftise'ce leşkerî de.

Güreş xwe li ser kar hişt

Hikûmeta koalisyonê ya Çiller û Înönü bi dirêjkirina wezifeya Serleskerê Artêsa Tirk Doğan Güreş, hemû ben û werisên rêvebirina sivil careke din dan destê hêzên leşkerî û yên ku wek leşkeran difikirin. Bi vê helwestê hikûmetê diyar kir ku, di mijara gelşa Kurdi de otoriteya sivil ne xwediyê tu biryare ye û her wiha di bin fermana ramanê kufiki yên leşkeran de ye û pirsgirêka Kurdi spartîye leşkeran.

Navenda Nûçeyan- Wezifeya Serleskerê Artêsa Tirk Doğan Güreş, di civîna Heyeta Wezaretan de, di 27'ê Tirmehê de bi Bir-yarnameya di Hukmê Qanûn de hate dirêjkirin. Li gorî vê biryare wê Doğan Güreş heta saleke din jî li ser karê xwe bimîne.

Li gorî qanûnê der barê wezîfe û rayeyên serleskeriyê ya bi hejmarâ 1324'an, "Sînorê temenê general û oramîralen ku tayînî serleskeriyê dibin 67 e û dema wan a li ser kar mayînê 4 sal e. Di peyitandina (tespîtkirina) wan a dema mayîna li ser kar de 30'ê Tebaxê binyat tê girtin." Ger ku dema wezifeya Güreş nehata dirêjkirin dê di 30'ê Tebaxa 1993 yan de teqawid bûbûya.

Berdevkê Hikûmetê û Wezîrê Dewletê Yildirim Aktuna sebebî dirêjkirina Wezifeya Serleskerê Artêsa Tirk Doğan Güreş wiha diyar kir: "Ji bo feydedîtina ji tecrubeyen Serleskerê Artêsa yên der inafê têkoşîna bi terorê li Rojhilat û Başûrê Rojhilatê (Kurdistanê)."

Bi dirêjkirina peywira (wezifeya) Doğan Güreş re hikûmetê bîr-yara domandina şerî gemarî da. Lewre di artêsa Tirk de Güreş wek parêzkarê domandina şer tê ditin. Di briefing û civînan de Doğan Güreş gelek caran daxuyaniyan dabû û bi awayekî tundî li hember bilîvkirina "realîteya Kurd" û "pirsgirêka Kurd" derketibû.

Li ser axaftinê Serokwezîra nû Tansu Çiller ên der heqê weşana radyo û TV a bi zimanê Kurdi û dersdayîna bi zimanê Kurdi de Güreş daxuyaniyê tund dabû û rexne lê girtibû. Li ser "çareya siyasî" ji ev nêrînê han anîbû ziman: "EZ ji çareya siyasî, rîlibergirin û çareyên leşkerî fêm dikim."

Heta ji bo dirêjkirina peywira xwe ya serleskeriyê ji gelek beyanat ji dabûn û rewşa xwe wiha şîrov kiribû: "Me di têkoşîna bi terorê re de gelek serfirazî bi dest xistine. Divê ev rengê têkoşînê bêrawestan were domandin. Niha di wê têkoşînê de em wek siwarkerî ku di nivenga çem mabe de, ne. Nabe ku mirov ji hesp peyâ be û bizivire." Bi vê şîroveyê daxwaziya mabûna xwe ya li ser kar bi awayekî ne raste rast anîbû ziman.

DEP'a Gazîosmanpaşayê vebû

Roja 25'ê Tirmehê li Stenbolê li navçeya G.O.Paşayê Partiya Demokrasiyê (DEP) bi besdariya partîvan û gel avahiya xwe vekir.

Piştî navçeyen Stenbolê Fatih û Kağıthane, roja 25'ê Tirmehê avahiya navçeya G.O.Paşayê ji bi besdariya partîvan û nêzîkî 500 kesî ve hate vekirin.

Serokê DEP'a bajarê Stenbolê Kemal Parlak ji partîvan û vexwendîyan re bi kurtî wiha axivî: "Partiya Demokrasiyê, partiya kedkar, xebatkar, karker, karmend, esnaf û heta niha ji bo azadiya xwe ku nesîbê xwe ji temamî tadeya dewleta Tirk û împerialîstan standîye, wê li ba gelê Kurd be û problemen wan li her derê Tirkîye wê bîne ziman û alîkarê wan be."

Serokê avahiya navçeya G.O.Paşayê Hidir Doğan ji wiha got: "DEP hewce ye ku muxalefeta gel nîşan bide."

Çapxaneya Aydinlar'ê hate şewitandin

Navenda Nûçeyan- Li Stenbolê çapxaneya Aydinlar'ê ji aliye alîgirê Dursun Karataş ve roja 28'ê Tirmehê hate şewitandin. Ev çapxane, demeke berê jî, ji aliye eyñî kesan ve hatibû rûxandin û xwedîyê çapxaneyê ji bo ku Kovara Devrîmcî Çözüm'ê çap nekin gef xwaribû.

Rêxistina Devrîmcî-Sol ev ji demekê ve ye bûye du parce û ev herdu alî bi navênlî alîgirê Dursun Karataş (ku serokê vê rîxistinê ye) û alîgirê Bedrî Yağan (ku yek ji pêşengên vê rîxistinê bû û demek berê li Stenbolê hate kuştin) têne binavkirin. Ji rîxistina Devrîmcî-Sol, alîgirê Dursun Karataş li hember hêza din êrîşen xwe didomînin. Heta niha nêzîkî 10 kesî ji aliye vê hêzê ve hatine kuştin, Bi dehan kes jî birîndar bûne. Metodênu ku alîgirê D.K bi kar tînin, ji aliye hemû hêzên sosyalîst ve



Alîgirê Dursun Karataş bi metodênu kontra çapxaneya Aydinlar ku hemû weşanên çep çap dikir, şewitandin

têne protestokirin û hêza D.K ji hemû derê hatine tecritkirin.

Pirraniya kovar, rojname û pirtûkên çepan li çapxaneyê Aydinlar'ê dihatin çapkirin. Di vê êrîşâ dawî de, 7 pirtûkên İsmâîl Beşîkçî, 3 pirtûkên Enstituya Kurdi, 2 pirtûkên Weşanên Zagros, pirtûkêk Weşanên Eksen (ku

hemû nû ji çapê derketibûn), 150 hezar heb afişen DEP'ê û gelek kovar û pirtûkên din jî şewitîn. Xesara Çapxaneyê nêzîkî 7 milyaran e.

Gelek rîxistinê çep ev êrîşâ dawî protesto kîrin. Kovara Devrîmcî Çözüm jî, di daxuyaniya xwe de, êrîşâ alîgirê D.K protesto kîr û vê hêzê weke kontra bi nav kîr.

Karker û karmend livbaziyê xwe didomînin

Navenda Nûçeyan- Karkeren girêdahiyê sendîkayên cur be cur û karmendên ku xebatkarên dewletê ne, her diçe dengen xwe bilindir û bi livbaziyê xwe hêza xwe xurttir dikin. Piştî beyana programa hikûmeta koalisyonê ku, rewşa karker û karmendan hê ji berê jî xerabtir kiribû, livbaziyê girseyî li dar ketin û çeperên livbaziyan roj bi roj berfirehtir û bîhêztir dibin.

Sendîkaya Türk-İş'ê ku li Tirkîye sendîkaya herî mezîn a karkeran e, amadekariyên greveke bi giştî didomîne û li ser vê yekê beyanan dide çapemeniyê. Serokê Konfedîrasyonâ Türk-İş'ê Bayram Meral, ji bo hikûmet mafêñ karkeran bi rîk û pêk bide, nêzîkî heftiyekê muhlet dabû. Lî tu deng ji hikûmetê derneketibû. Li ser vê yekê, ji bo greveke bi giştî pêk were müjûya 3'yê meha Tebaxê biryare hate girtin. Ger ev grev pêk were, dê bi sedhezaran karker dev ji kar berdin û dê ekonomiya dewletê û hemû dezgeh û kargehêne wê felc bibin.

Hikûmeta koalisyonê, hemû karxaneyen di destê dewletê de dixwaze bifroş. Prog-



Tirkîye bi livbaziyê karker û karmendan diheje. Wisa xuya dike ku, dê livbaziyê mezintir pêk werin.

rama hikûmetê ya ekonomikî bi giştî li ser vê programê amade bûye. Arizîkirina (özel-leştirme) kargehêne dewletê, dê bibe sebebê bêkarmayîna bi sedhezaran karker û karmendî. Hikûmet ji niha ve eşkere kiriye ku, dê 900 hezar karmend ji kar derxin. Ev yek dibe sebebê serhildana karker û karmendan. Li hemû deveren Tirkîye ji bo protestokirina vê biryara hikûmetê livbaziyê mezîn pêk tênu û wisa dixuyê ku, dê livbaziyê û bûyeren girîng pêk werin.

Di vê navêde, çapemeniyê Tirkîye jî bi hemû hêza xwe ve alîkarî dide arizîkirina kargeh û dezgehêne dewletê. Karkeren girêdahiyê sendîkaya Haber-İş'ê ku di PTT'ê (Posta, Telefon, Telgraf) de dixebeitin, daxuyandin ku ev tewra çapemeniyê bidome, dê hemû telefon, teleks û faksen wan bibirrin û ji bo vê yekê xwedî hêz in.

Jutiya Aleviyanê Kurdistanî de ju reportaj

Lerzan Jandîl

Verde ma şima nasbikeme

– Ez Jutiya Aleviyanê Kurdistanî ra Hasan Bazkurt a

Bira Hesen, çika ma Jutiya Aleviyanê Kurdistanî, na jutiye çi waxt ama ronayene û aramancê na jutiye çiko? Ti şikina keremê xo ma re tayê nayê ser ro vinderê?

– Jutiya Aleviyanê Kurdistanî emser aşma hirine de amê viraystene. Baş naye ra ver ma ne derheq de ebi hevalên bîna qese kerdî, ma jubînî çand dolimî dîbî.

Ez wazena naca çiyê vacê. Ez jutiya Aleviyanê Kurdistanî ra Hidir Aslan a. Mordemî şikino vaco ke ma no jutiya xo serê nayê ra ver di viraystene. Hama ma ebi raştiye emser bîme ze ju organizasyonî, ze ju rayetistene. Armancû hecetê ma ji nê we. Hetanî nika dişmenanê ma, ma kerdîme lete, wertê Kurda de cudadiyê zaf girs vettî û ebi naye ji êbi rehetiyê erê ma hukum kerd. Euro ma vanîme beso. Şarê ma ji ze şaranê bîna heqâ xo herçî de esto. Ma ganî hemwerê dişmena koledara jutiya çarê xo xurt keme. Alevîtiyê, sunîtiye û êzdîtiyê wertê şarê xo ra wedarîme.

Ez ji (Hesen) wazena nayê ser ro çiyedî kîlm vacî. Koledara hetanî nika şarê ma ebi no qeyde xapito. TC ebi na qeydi şarê ma kerdîme lete, lete, utiya şariyê ra ve-to. Hedefî ma xirabkerdana nê sistemî û koledarî ya. Ma alevî sunî birayê jubînî me.

Rinda alevî û sunî birayê jubînî yê. Baş birayê jubînî ye, hama wertê dîna de ji bir û baweriya cudyaya esta. Ti se şikina vacê wertê aleviye û suniya de qe çiyê çîno. Xiristiyana de ji bir û baweriye cudyayî estê. Hetanî dişê hazar sere nayê ra ver o-diyê mesebanê dînê xiristiyaniye biyê û nê ordiya jubînî de ser kero. Dînê İslâmî de çiyê nîya gîrsî çînebiye, hama wunciya ji cudatî estê. Bê nayê ji mesela aleviye meselî de newiyê nîya. Verê Osamaniya ji biya, wertê ereba de biya û euro ji esta. Seba nayê ji ez wazena pers bikerî; na mesela se hal bena, yan ji ez niya pers bikerî; ma alevî sunî êzdî se şikime, bibîme jubînî yêke jubînî de ser nikene?

– Nika na persa to persêde raysta. Na mesela newe niya, rew de esta. La belê ma nika nê kara ji keme. Alevîtiue çika? koti re êna kankanê xo çikê, qeyî alevî sunî biyê dişmenê jubînî yan ji va tenêde bîne qeyî jubînî yê. La belê sunîtiyê boda biya mesebê dewletê wo resmî. û ebi nê qeydi wertê şarê ma de cudadî amê vetenê. Hemverê nayê alevî ji lewê feqîrâ û mazlûma di biya û ebi naye ji alevîtiyê xîlê zîl û zor diyo gor sunîtiye. Dewletanê koledara na mesal her tim xebet-na. Vato ke; “Dînê aleviye çîno û ma û piyê xo. Wayo xo nas ni-



kenê.” Koledarî çayê xo de nîse-ro, alevî û sunî verde pê, verdê re jubînî dê kiştene. Na hatanî ewro niya ama, la belê nayêra dime nişikîne. Ma îndî raye nidame nê kaya. Seba nayê ji mi va ma birayê jubînî me. Nayê ra ver wretê ma de çiyê çînebiyo kaledara ma û cîranê me verdê pê, ma kerdîme dişmenê jubînî Angora ke ewro ma restime çi ganî ma ju bîmî. Kara ma ju ya hedef û armancê ma ju yê. Ma fîrsend medîme dişmenanê xo. Ma ewro rind zanîme ke ma dişmenê jubînî nîme.

Sebeta ke alevî û sunîtiye Kirmançî bişîkiyê ze biraya jubînî-de derbaz bikerê, karê şima (Jutiya Aleviyanê Kurdistanî) û karê camiya Kiamanca (Yekîtiya Dîndarîn Kurdistan) çikê?

– (Xidir) Vîzîrî ma ju repor-tajede bîn kerd ma ra ju hevalî vakê; “Ma lewê camiyê de Bonê Cemî (Cem evî) wazeme. “Na kewte serê ma van me ke her kes qeyde û esasanê dînê xo, ibadetê xo, gorê bîr û baweriya xo, se wazeno wa hînî biyaro ca. Yane kes zor bi kesî nekero. Dîn bîr û baweriya dînî sebebê xirabbiyena biratiya ma mebo. Hevalî sunî ji ze ma fikirînê. Ebi Yekîtiya Dîndarîn Kurdistanî eleqê ma estê. No girêdayê ma û karê ma wo. Ma ke şarê xo de bixebeftîbe, bidîme dê û dê ra bidîme, ez bawer a ke ma nayê ser de ême.

– (Hesen) Na şikiyena ma îspat biyo. Euro koyanê Kurdistanî de her hetra, her şenikîyê ra (azinlik) her mezheb bîr û baweriye ra şerwanê ma estê, û ica Kurdistanî qışkek do viraystene û ze biraya tê lewê de re, wertê xo de şoreş û demokrasî kero ava. Meyşte ji ma, roşnaya nayê de Kurdistan de sistemîde nîyanê ava keme. Euro şarê ma, zafîriya şarêma ji na rayê de ro. La belê tayê xo huna nizanê, binê esîre Kemalîzîm de re. Kemalîzîm nê mordem-

mî henî dinê ra kerdê xerib, ke nê dişmentiya xo kenê, dişmenê xo yê. Ebi na vejîyenâ xo, ma wa-zenîme roşnaya şarê xo bîmî.

Euro şima seba çinayî naca-re, şima çinay re grevê vêşanîyê kenê?

– Sere ra yane Osmaniya ra hetanî nika qetliyamî bî û bê gu-man nê qetliyamî kuli feqîra sera bî, qulî belengaza sera bî. Kuli kam ke vengê no nikerd dîna sera bî. Nê ji ebi zafîriya şarê ma no alevî bî. Wuxtê Osmaniya de zîl û zordariye nîna ser ro zaf biye. Pîr Sultan Osmaniya darde kerd. TC ji dewanê Osmaniya wa. Nayê ji Koçgîrî de, Dersimî de, Sewaz de, Meletiyê de, Çorum de, Meraş de nê qetliyamî kerdî. Şarê ma na ew xo vîra kerde. Ni-ka ji mesela Sewazî esta. Sewaz de dewleste ebi destê xo dînperestî organize kerdî, destê xo planê her çi virayst û roja şahîyanê Pîr Sultan Abdalî no qetliyam da vi-raystene. Baweriya ma na wa: Şarê ma, şarê Kurda wuştî re lin-ganê xo ser. O ji wazeno ze şarenê serê harda wayirê her heq mafanê xo bo. Dewleta Tîrkî ebi na qetliyamî wayst, ke na mesela vîndî kero, werte ra we daro. He-to bîn ra ji Rojava ra hetkariye ebi na enwayî bicero; “Niyadê welat de İslâmî estê, Kurd ji vejîyât, her kes xo het ra çiyê wazeno ga-nî ez conta virazê, darbe bikerê. Ganî ez nîne bixelînê.” Seba nê qetliyamêk biyê û bénê ma roja 15.06 ra hetarı roja 30.06.93 grevê vêşanîyê de viraystene. Ne grevî de 3 çenê, 1 xort û 1 ji he-valî ma wo Tîrk esto. Ma roja 24.06.93 ji germiya aşura keme vîla. Ebi naye ma wazeme dînya pîro heşar bo, şarê ma wa heşar bo. Ju ji felsefa alevîtiye felsefîde demokratik û avêsiyayena. Ganî ma ne felsefa alevîtiyêna niya rîne biresnîme tornanê xo, biresnîme neslanê ke ma re dime ênê.

Persêde Mamoste Cemal

ne. Nayêra vist sere ravê “çepanê Tîrkî” vatêne; “Na ci alevîtiya, no ci dîno, şima alevîtiye, şima dîn kenê orte”. La belê ewro ji, ê ale-vîtiye dime şone. Hama gorê ma, eke na baweriye di biratiye, rindi-ye, hevalbediye esta, ganî ma wa-yirê nîna vejîme. Ewo welatê ma de partiya ma esta, partiya ke ma re raye raxeleşiyena netwî kerda-ra. Ganî ma na rayê ro şîme.

Ti rind vana bîra, la belê hu-na xîlê mordemê ma estê, û ne xirab ji niyê, “welatparez” e ji, hama mesala aleviye de vanê ke; Alevî maya xo waya xo nas nikenê, ez niya pê hesiyane”

– Ewo kamcî Kurd ke şîyo, yan ji şoro rojhîlat meselîde niyan-nene dê sera derbaz bena. Ya ci-ra vanê ti “Kiro wa” ya vanê “ti maya xo waya xo nas nikena, şîma mume şaynenê”. Nayê teyan nivanê. Dewa ke ponsê métro duriya ji, vana. Çimke wertê aleviye û suniya de eleqê çînebiyê. Dewlete wertê na hawtaye sere de nê eleqe visnê. Ê ji ïnam nêbenê, hama wunciya ji henî vanê. Hama ewro, ê ji wertê aleviye de re. Qayt kenê ke çiyedî niyanen çîno, na zura. Dewlete e-bi na zure û zuranê niyanenâ wa-zena şarê ma ebi destê dê bidêro qırkerdene. Dewlete çığa ke kuna tengê, ere raxeleşiyena xo, hetê aleviye de cêrena. Êna aleviye pê cêna verdana suniya, suniya pê cêna verdana aleviye. Na zura corêne kes nîşikîno îspat bikero. Cemê ma, ibadetê ma esto, la belê yê bînî pê ro koke ra zurê. Zura TC. wa.

Ju bîr û baweriye esta, vanê “Kamcî sistêm de beno wa bîbo, ha sosyalîzm, ha kapitalîzm, ci beno wa bîbo, heke şenikî xo organîze mekerê, wayirê heqanê xo mevejiyê. Sosyalîzm ji nîşikîno wayirê heqanê dîna vejiyo.” Na vatene rayst a, yan ji rayst niya?

– Heya rayst a
Ma na seba aleviye ra se rayst a, se derbaz bena?

– Nika, ju ke vêşan bo, ganî o bi xo non biwazo. Ganî mordem bi xo, wayirê namê xo, namusê xo vejiyo.

– (Xidir) Se ke heval Hesenî ji va ganî ma bêmetê lewe, dost û dişmenanê xo nas bikeme. Teyna niya ma şikime qetliyamana nexe-lesime. Ü meyşte bîro ji Kurdistan de nê problemê nîyanenî wa mevejiyê.

Na jutiya şima welat de ji es-ta?

– Hêya nika welat de, cawo ke Kurdê alevî estê, na jutiya me ji esta.

Aleviyanê Kurda ra waystenê şima çikê?

– Kurda ra waystenê ma nê wê; “Wa wayirê xo vejiyê, wayirê dawa xo, kulturê xo vejiye û Lewê Jutiya Aleviyanê Kurdistanî de cayê xo bicero.

Zaf spas
– Spas wes



Kirinek hêjayî hezar gotinî ye.

Gotineke Pêşyan

Di şeşekê de 10 hezar Kurd jînên xwe berdan!

Tansu Çiller di 20.7.1993'yan de, di TV de, got ku: "Kurd û Tirk keç dane hevdu. Em xinamîyên hevdu ne. Em bûne wekî goşt û neynokê. Em ketine nav hevdu û bûne miletet. Nabe em ji hevdu vejetin..."

Li ser vê gotina Tansu Çiller, di navbera çend saetan de ji 10.000 bêhtir Kurdan nîşanen xwe vegerandin û dev ji destgîtiyên xwe yên Tirkan berdan. Ên zewicî û xwedî jin û zarok ji, jînên xwe berdan. Hem ji bi riya telefon û faksan. Ew Kurdîn ku ji 15-20 salan zêdetir in ku bi Tirkan re zewicibûn xwedî kom û kulfet bûn dev ji jînên xwe berdin. Zarokên wan bê dê û bav man û ketin kuçeyan. Li gor istatîstîkan pirraniya jinan Tirk û mîr ji Kurd in. Ji ber ku Kurd ji ber bêkarî û ji psikolojiya bindestiyê bi keçen Tirk re dizewicin. Jinebi û vegeriyên Tirk di nav xwe de Komela Parastina Mafîn Jinebiyên Tirk çekirin û Serokatiya Komeleyê bi Tansu Çiller re li ser pirsa hevberdanê civînek çekir. Jê re li çareyên nû digerin. Slogana jinebi û keçen berdayî yên Tirk ev e: "Tansu tiştekî nekir, xweli li serê me kir. Destê me û mîrê me ji hevdu kir!"

Her ku diçe jînberdan di nav Kurdan de zêde dibe. Bi taybetî di nav xwendekarêne Kurda de. Ji ber ku xwendekarêne Kurdan bêhtir bi keçen Tirk re zewicîne. Heger rê li vê yekê neyê girtin, dê di navbera hefteyekê de hejmara jînberdanê bigihe nîv milyonî.

Lê, hezar mixabin wekî ku di her warfî de cehş û xayînên Kurd hene, her wiha di warê jînberdanê de ji, çend serjinik û devjînikên Kurd ji dîsa derketin holê. Ew dibêjin: "Tansu rast dibêje em jîn û mîrên Kurd û Tirk bi hevdu ve zeliqîne û bûne wekî goşt û neynokan. Qet ji hevdu nabin ji. Yekîtiya mîlet ev e. Jin û mîr dîbin yek û ji wan û ji zarokên wan yekîti çedîbe. Em ne parvekar in, em bi hevdu ve zeliqandî ne." Televizyon Tirk Interstar di vê babetê de bi du zavayêne Tirk re hevpeyvîn çekir. Herdu zava ji Kurd bûn û parlamenten bûn. Yek ji wan ji partiya Tansu Çiller parlamentere Amedê M. Salih Esrarlıoğlu bû, yê din ji Wezîrê Karê Derveyî yê hikümeta Tansu Çiller Hîkmet Çetin bû. Herdulan ji digot: "Jînên me Tirk in û em ji Kurd in. Em bûne miletet."

Li gor ajansan hinek jînên Tirk en ku bi Kurda re zewicîne, dixwazin careke din mîrê xwe yên Kurd bixapînîn û bi paş ve vegerin. Hinek mîrên Kurd li ser

vê yekê disekinin, hinek ji dijwar in, bi fikir û dibêjin, "Na tu heta doh Tirk bû û iro ji bûyî mînorîtet ne!" Hinek ji wan jînan serî li avûqatan dixin ku secera xwe derbixin holê ku ne Tirk in... Ji demeke dûr û dirêj ve jixwe avûqat vala û bêkar bûn. Ji ber bêkariyê ew bi qumarê dilîstîn. Niha kar ji wan re derket. Di buroyen wan de cîhê rûniştin nemaye.

Di nav jînên Kurdan ên ku bi xwe Kurd bûn, lê carinan digotin, "Em Tirk in" û di mala xwe de her tim bi mîr û zarokên xwe re bi Tirkî diaxiviyan de ji panîkek çebû. Heta wê rojê digotin, "Em ne gundi ne, em bajarî ne û ji ber vê yekê ji, em bi Kurdi nîzanîn." Lî, pişti vê bûyerê di eynî rojê de, jînên Kurd û Tirk ji, dest bi axavtina Kurdi kirin. Edî bi mîr û



zarokên xwe re bi Kurdi diaxivin. Li hember mîrên xwe nazîk dîbin û dilê mîrê xwe nahêlin. Xwarin û ziyaferîn xweş ji wan re çedîkin. Wiha xuyaye ku heta çend mehan zimanê Kurdi dê gelikî bi pêş ve here û çapa Welat û weşanen Kurdi yên din ji, dê gelek pirr û bilind bibe.

Te dit di nav me Kurdan de jînanîn gelekî zehmet e û jînberdan ji gelek hêsan e. Di vê bûyerê de Kurd metod û edetîn telaqavetiñê bi kar tînin. Mîr sê kevir dikin destê xwe û dibêjin: "Jî vir heta bin dara givîja Bexdayê tu ji min berdayî..." û her sê keviran diavîye erdê. Pêwest e ku pişti avêtina her sê keviran jîn ji malê derbikeve û here mala bavê xwe.

Mehkemeyên Tirkan bi lez û bez dev ji hemû daweyêne din berdan û dest bi daweyêne hevberdana Kurda û Tirkan kirin. Mehkemeyên Tirk wekî ku di her babetî de dikin, di vê babetê de ji alîkarî û piştgiriya keçen xwe dikin û dixwazin cezayêne giran bîdin zavayêne xwe yên bêbext û xweliser. Hakim (dadger) û saw-

ciyên (dozger) Tirk li fen û fûtîn qanûnî digerin ku çawa pêş li vê bûyerê bigirin. Ew dibêjin: "Rast e, edetîn Kurda û jînberdanê bi sê kevir avêtinê dibe û bi wan jîn tê berdan, lê ev bi hinek şerstan dibe. Mesela divê her sê kevir di destekî de bin û bi carekê de bîn avêtin. Di serî jîn û paşê du şahîd bi çavên serê xwe avêtina keviran bibînin. Pêwest e ku dengê şeqîna keviran ji here jîn û şahîdan. Niha pirraniya Kurda bi telefon û faksan jînên xwe berdin. Ev berdan li gor avêtina sê keviran nabe. Yek, di telefon û faksan de, jîn bi xwe avêtina keviran nabîne. Dido, şahîd li navê tun in. Sisê, dengê şeqîna keviran naçin jîn û şadîdan. Ji ber van sedeman ji em berdana bi vî awayî qebûl nakin. Ev li dijî qanûn e. Yanî şertîn berdanê nehatine cih.

Mîrên Kurd li ser van astêngîn mehkeme yên Tirk taktîk guhertin. Ji bo îspatbûnê û pûç-kirina idayîn mehkemeyen Tirk bi kamereyan filmen telaqavetiñê xwe digirin. Ji bo bi garantibûnê ji kopyekê dikişin û ew li ba xwe dihêlin.

Serokzîra Tirkîye pîrhevok Tansu Çiller, ji ber çewsandin û tesîra Komeleya Parastina Mafîn Jinebiyên Tirk, ji bo kombûna parlamentoyê bi rîdan û dîrekîta bavê xwe Siloyê Keftar bi lez û bez qerarnameyekê derxist ku hemû parlamenteji semestira (vîsanâ- tatîla) xwe ya Antalyayê vegerin û li parlamentoyê li ser vê yekê civîneke awarte çebîkin. Li gor mixebîrên Înterstarê ku ew pirr nêzîkî Tansu Çiller, alîkarê wê Apdal Eloq û Kerenalân in, dê Çiller bi pêşniyariya qanûneke çarbendi civîna parlamentoyê ya awarte vebike. Musweda qanûnê wiha ye:

1. Kurd tun in ji ber vê yekê qanûnê wan a sêkevirî derbas na-be.

2. Ew kesê ku jîna xwe berde (bi ci qanûn û edetî dibe, bila bîbe) tevî qanûnê terorê dibe û di cih de divê ji karê xwe bê avêtin.

3. Ên ku di vê babeta jînberdanê de israr bikin, sîrgûn (neft) ji di nav de ji 8 salan hetâ 15 salan bê cezakirin.

4. Wezareta Serjinik û Devjînikan bê damezirandin.

Ev wezareta han dê hem mafê jînîkî û berdayîyan biparêze û hem ji, ji bo zewaca Kurd û Tirkan xebat bike û imkanîn mezin çebike. Heta ew wezareta han dê bikaribe alîkariya qelen, mesrefa nîşan û dawetê bike. Heta bikaribe pereyê makyajê ji bigire ser xwe.

M. Xarpêti

TÎR

Musa Anter



Şervanê bi pêñûs: Apê Mûsa

Dema min di dibistana navîn de dixwend, hoy û rewşa gelê Kurd pirr ne xweş bû. Dagirkiran eslê me bi me dabû jîbîkirin. Dema ku digotine me "Kurd" me digot qey heqareteke mezin li me dikin. Lewre me lingê xwe avête dibistanê û bi sonda "Tîr im..." me dest bi xwendinê kir. Serê pirtûkan Atatürk û binê pirtûkan Atatürk... Ji ber ku me ji bav û diyen xwe tiştekî rast nedîbihîst, em geleki di bin bandora Kermalîzîmê de mabûn. Bi gotineke din ez bibêjim, em pişav (asîmîle) bûbûn.

Ez ji weke hemû zarokên Kurd bêhiş û şevezkor bûm. Rojekê bi pêwana hevalekî xwe ji Nîsêbinê min navê Apê Mûsa bihîst. Li ser xebat û girtinê wî ez agahdar bûm. Dû re min pirtûkên wî "Birîna Reş" û "Qimil" peyde kirin û xwendin. Heta wê hengê min bawer nedîkir ku pirtûkên bi Kurdi hene. Ez ji reşahiyeke tarî derketim. Min xwe dit.

Piştî ku min dibistana mamostetiyê qedand, li gora xwe li ser çand û zargotina (folklor) gelê xwe min lêkolîn kirin. Ji aliyekevi ve ji min dest bi nîvîsa helbestan (şîir) kir. Astengî û kîmasiyê min ji aliye cihderk û berhemîn nîvîsi yên bi Kurdi pirr hebûn. Lî dema ku ez çûme cem Apê Mûsa û min ew nas

kir, ez ketime gerdûneke din. Niha min deryaya çand û zargotina Kurdi kîfî kir. Pirtûkxaneya xwe ya herî dewlemend li ber min vekir. Weke yekî tî ku here ser kaniye û têr nebe, li min hatîbû. Pênc salê min li cem bi hurîn. Mîna pênc rojan tê ber çavê min. Dema ku min ew nas kir, dev ji xebata nîvîsandinê berdabû. Xwe bi bexçeyen tije dartam û xwedîkirina çûkan, pisikan û wan mijûl dikir. Rojekê ez û ew bi tenê, li nav bexçeyê wî digeriyan. Disa ketibû he-nekan û wan peyvîn xweş. Ez bi pirsgirêka di serê xwe de mi-jûl bûbûm. Min dengê pîrsa ku ji min kirî nebihîst. Bi dengekî bilind got: "Jîr, lawo guhê te ne li min e?.. Min pirsek ji te kir." Min bi fedibûn got: "Apê Mûsa li min ne gire. Hişê min li dereke din bû." Bi wî zarê xwe yî xweş got: "Bibêjê lawo... Ku tiştekî bi min biqede?" Ez li hêviya peyveke wilo bûm. Min bi gazin got: "Apê Mûsa ez dinêrim, dema ku kesekej hay ji Kurd û Kurdistanê tune bû, te di wan astengîyan de dozeke dijwar ajoitiye. Tu dîrokzan, tu deryaya çand û zargotina gelê me yî, lê mixabîn, te ev çend sal in dev ji wan nîvîsin delalî berdaye." Bi ken û bi tinaz got: "Hema va tu binivise..." Min got: "Apê Mûsa he-nek li dera han, tu, tu tişti neki ji, bîranînê xwe binivise. Ewê ji bo nişen nû, nişen ku werin bibine ronahiyeke girîng. Serê xwe hejand û besîşî. Hew deng kir.

Rojekê xeber ji min re şiyand. Got: "Were mala min." Ez rabûm cüm, min nîrî nameyek nîşanî min da. Bi ken got: "Ka were... Xwedê zane lê we tevan reda min bir. Ev name ji hevalêkî min hatîye. Ew ji doza nîvîsandinê li min dike. Min bîryar da, ezê dest bi bîranînê xwe bikim. Min li nameyê meyzand. A Şahap Balicioğlu bû. Bi wê bîryara wî ez gelekî xweşhal bûm.

Dest bi "Bîranînê Min" (Hatîralarım) kir. Her roj ez diçüm balê. Tiştekî ku dînîvîsi ji min re dixwend. Di wan rojan de, di rojeva Tirkîye de li ser pirsgirêka Kurdi di çapemeniyê de gelek guftûgo çedîbûn. Apê Mûsa nîvîsek ji "2000'e Doğru" re amade kir. Piştî ku ew nîvîs hate weşandin, ji çarmedor pîrozname lê barîn. Hêstir ji çavên wî herikîn û wiha got: "Van pîrozname ez kirime xorkejî çardeh salî. Min di dawîya temenê xwe de ev ji dît. Edî çavên min vekirî naçin gorê." Bi rastî ji mîna xorkejî çardeh salî xwe berda meydana şer û cengê. Lî çeka wî pêñûsa wî bû. Bi wê pêñûsa xwe çavên dagirkiran rijandin erdê. Dest û lingê wan girê dan. Zimanê wan ji qurmê hilkir. Ji ber wê yekê li Amedê kozik û kemîn di pêşîya wî de danîn. Wan gote emê bikujin wê tûne bibe. Nîzânibûn ku Apê Mûsa ji nû ve li Amedê hate dinê û di dilê gelê Kurd de dijî û wê her bijî...

Divê em ji, pêñûsa Apê Mûsa li erdê nehîlin. Heta zimanê me bigere û destê me bilive em binivîsin.

Jîr Dilovan

Çapemeniya Tirk: Berdevka faşizmê

● Çapemeniya Tirk roj bi roj ji nixxen mirovahiyê û ji rûmeta çapemeniyê dûr dikeve. Ji xeynî rojnameya Gündem'ê, Aydinlik'ê û çend muxabîren rojnameyên din ji ne tê de hemû muxabîr, nivîskar û berpirsiyarên rojnameyên rojane û kanalên televizyonê ji berdevkiya generalan pêstir tiştekî din nakin. Çapemenî bi nivîs û nûçeyên xwe, ronahîkirina raya giştî li aliyekî, mejiyê mirovan li hev dixe û bi metodên psikolojîk rê li ber pêşveçûnên tevgerên azadî û demokrasiyê digire û ji rayedarên dewletê zêdetir, dewletê ji dil û can diparêze.

Navenda Nûçeyan- Çapemeniya Tirk a ku ji berê ve her tim ji xeynî lihevxitina mejiyê mirovan tu tiş nekiriye û bala gelên Tirkîye ji ser bûyerên girîng kişandiye ser bûyerên çêkirî, di hefteyên dawî de bi taybetî jî, ji Brîfinga Konseya Ewlekariyê û vir ve, hîn zêdetir ji taybetiyên çapemeniyê dûr ket û bi temamî bû berdevka general û dewlemendên Tirkîye. Bi vê tewra xwe ya durû –ji ber ku ji aliyekî ve behsa demokrasiyê dike, ji aliyê din ve piştgiriya herî mezin dide general û kompradorên ku rê li ber demokrasiyê û azadiya gelan digirin-mînakeke bêhempa ye di nav çapemeniya hemû welatan de.

Li Tirkîye di nav rojnameyên rojane de ji xeynî Özgür Gündem û Aydinlik'ê hemû rojnameyên Tirk bîst û çar saet propaganda dewletê û ya generalan dike. Bi şev û bi roj berpirsiyarên van rojnameyan di bin çengê dewlemend û generalan de, ji vê kokteylê diçin ya din û ji bo tevgerên azadiyê û çalakiyên karkeran bêñ rawestandin bi hev re planan çedikin.

PIŞTGIRA QETLİAMAN

Di rojname û kanalên televizyonê Tirk de hemû nûçe, nivîsîn quncikan, program, reklam û film di nav çarçoveya planê şerê toþyekûn de têne hazirkirin. Polis û tîmîn taybetî yên ku her roj bi dehan zarak, jin û xortê şoreşger qetil dike wek parêzvanen

gel û xizmetkarên demokrasiyê têñ pêşkêskirin da ku di çavêñ gelên Tirkîye de şîrîn bêñ xuyakirin. Li aliyê din, servanên azadiyê û xort û qîzîn pêşverû yêñ ku ji bo gel canê xwe bi dilxwazî feda dike wek gangster, eşqiya û cinawiran di çapeminî û televizyonê Tirk de nîşanî raya giştî didin.

Berpirsiyarên rojnameyan ji bo ku Artêşa Tirk memnûn bikin ci ji destê wan têñ dike. Rojnameyên rojane yêñ wek Hürriyet, Sabah û Millîyet ku carina ji bo kampanyaya ansiklopediyekê dikevîne qirika hev û tiştek namîne ji hev re nabêjin, di pirsa Kurdi û parastina nîjadperestiya Tirk de bi hev dişewirin, bi hev re kar dike û eynî manşetan diavêjin. Li hember çalakiyên PKK'ê gelek caran berpirsiyarên van rojnameyan ji bo ku manşetân xwe kifş bikin bi rayedarên leşkeriyê dişewirin û eynî tiştan li gor dîrektîfan dînîsin.

DILXWAZA NEYARTIYA GELAN

Çapemeniya Tirk bi mebesta ku gelê Tirk li dijî gelê Kurd tahrîk bike û wî ji pirsgirêkîn wî yên bingehîn dûr bixe, bûyerereke nehêjayî weşandinê, di manşetê de dide, bûyerên herî girîng ji yan berevajî dike yan ji qet nade.

Berpirsiyarên çapemeniyê yên ku tenê li teniştâ rayedarên dewletê diçin Kurdistanê, di şûna ku rewş û dîtina gelê Kurd bînîsin, gotin û axaftinê

● Rojname û TV'ên Tirk bi taybetî dijminiya xwe ya li hember gelê Kurd her diçê zêdetir dike da ku bikevin çavêñ general û dewlemendan, ji wan xelatan bistînin. Di şûna ku muxabîran bîşînîn Kurdistanê û li wir rastiya bûyeran hîn bibin û bînîsin, di navendêñ xwe de agahiyê li ser Kurdistanê ji MÎT û berpirsiyarên leşkerî distînin û li gor dilê wan dînîsin. Ji brîfinga ku meha çûyi Serleşkerê Artêşa Tirk Doğan Güreş da çapemeniyê û vir ve çapemeniyê hîn dostaniya xwe bi serdestan re, dijberiya xwe ji li hember gelê Kurd zêdetir kir.



Berpirsiyarên rojnameyên Tirk li kîleka rayedarên dewletê rûdinin, çavê xwe digirin û milahîm milahîm guhê xwe didin şîretên wan. Bi vê helwesta xwe çapemeniya Tirk ya herî rûrê e, di nav çapemeniya hemû welatan de.

serokwezîr û serleşkerên Tirk diweşînin.

Nivîskarên quncikên rojnameyên Hürriyet, Millîyet, Sabah, Tercüman, Zaman, Türkiye, Cumhuriyet, Bugün, Meydan, Gün, Millî Gazete û hwd. ku her tim bi nivîsîn xwe piştgiriya gelên bindest ên wek Filistînî, Efrîqî, Bosnayî dike, cepikan ji Artêşa Tirk a ku gelê Kurd qetil dike re li hev dixin. Li aliyekî xwe wek dijberê İsrail didin nasîkirin, li aliyê din, ji rayedarên Tirk re tewsiye dike ku têkiliyên xwe bi İsrail re zêde bike da ku taktikên ku ew li dijî Filistiniyan bi karîne, Tirkîye ji li dij gelê Kurd bi kar bîne.

PRENSİBÊN ÇAPEMENİYA TIRK

Di hemû kar û barêñ çapemeniya Tirk de êdî eşke-re bûye ku tu prensibên çâ-

pemeniya navneteweyî naşopîne. Ji çapemeniyê zehftir bûye dengbêjê dewleta dagirker. Di şûna mafê rojnamevanen bi rûmet de mafê kesen li van kesan neheqî dike diparêze.

Êrîşen ku dewleta Tirk dibe ser rojnamevanen Özgür Gündemê ji aliyê çapemeniya Tirk ve tê teqdîrkirin. Di hewlîdanen dewletê yên girtina rojnameya Özgür Gündemê de dema ku hemû çapemeniya dînyayê piştgiriya xwe da Gündemê û vê tewra dewleta Tirk wek kirineke li dijî çapemeniya navneteweyî nirxand û dewleta Tirk protesto kir, çapemeniya Tirk pêşî bi guhê kerr bes dû re bi vê ji nema, piştgiriya girtina Gündemê da dewletê û di şûna ku êrîşen li dijî rojnamevan protesto bike, bû alîgirê dewleta faşîst û dagirker. Serokê Yekîtiya çâ-

pemeniya Tirk Engîn Baydar li Helsînki Sanomat de alîgiriya xwe ji bo girtina Gündemê anî ziman.

Wekî din, her roj di rojnameyên xwe de Gündemê wek rojnameya PKK'ê didin naskirin û bi vê awayî dilxwaziya xwe ji bo girtina wê diyar dike.

RIYA ÇAPEMENİYA TIRK

Pêwist nake mirov ji çapemeniya Tirk nivîsîn mînak yên ku alîgiriya faşîzmê dike; ji ber ku her roj, ji seri ta binî bi van mînakkan tije ne û ji dewletê zehftir dewletgir e.

Çapemeniya Tirk û çapemeniya rasteqîn êdî du saziyên ji hev pirr cihêregîn. Yek dijbera ya din e. Riyen wan ji hev qetiyane, yek jê berdevka raya giştî û alîgirê demokrasiyê ye ya din xulamtiya faşîzmê dike.

Navenda Nûçeyan- Peymana Lozanê ya ku di 24'ê Tîrmeha 1923'an de, di navbera welatên hevalbend û Tirkîyê de hatibû ìmzekirin û rewşa hindikahiyen li Tirkîyê, tixûbêñ Tirkîyê û bikaranîna tengavêñ wê kifş kiribû, di konferansa ku, rîexistinêñ Kurd, Delegasyona Konseya Ewrûpayê, rîexistinêñ mafêñ mirovan û Komeleya Dostêñ Kurd ên li Swîsreyê beşdar bûbûn de, "nelê" hate îlankirin. Di dawiya konferansê de danezanek (deklerasyon) ji 15 madeyan bi yek dengekî hate pejirandin.

Di danezanê de ji bo bîyarêñ di konferansê de derbasî jiyanê bibin, avakirina Komisyonâ Destekkirin û Parastîna Mafêñ Gelê Kurd di qada navneteweyî de, hate îlankirin. Di danezanê de hate talepkirin ku, divê ev komisyon bi armancâ xebatêñ xwe yêñ parastina mafêñ neteweyî û însanî yêñ gelê Kurd di çarçoveya hiqûq û diplomasîya navneteweyî de bidomîne, li bajarê Lozanê bê navendikirin. Ji bo vê yekê jî, amadekariya komisyon, rîzname û projeyan didomin.

Li aliyê din, di deklarasyonê de, welatên ku peymana Lozanê ìmze kirine hatin protestokirin. Neteweyen Yekbûyî jî, ji ber helwesta wê ya newekhev ku mafêñ Kurdan ên neteweyî nas nake û ji bo aştiyê nalive hate protestokirin.

Serê sibeha ku, dê konferans li dar bikeve, ji çar aliyen Ewrûpayê Kurd, li kolanê bajarê Lozanê meşyan û peymana Lozanê protesto kiran.

Serokê Belediya Lozanê Yvette Jaggi, hê ku meş didomiya ji bo çapemeniyê civînek li dar xist û beyanek da çapemeniyê. Yvette Jaggi di beyana xwe de da kifşkirin ku, bi nebaşiyen vê peymana yêñ li ser gelê Kurd dizanin, lê nabe ku bajarê Lozanê ji ber ev peymana li wir hatiye ìmzekirin

Nûçevanê Gündemê revandin

Navenda Nûçeyan- Nûçevanê Özgür Gündemê yê Bilîsê Ferhat Tepe ji aliyê polîsên sivil ve hate revandin. Pişti revandina Ferhat Tepe, mirovek bi telefonê li malbata wî geriya û bûyerê li ser navê "Yekîneya Osmanî-Tirk a Tolhildanê" girte ser xwe. Ev rîexistin, mîna rîexistinêke kontr-gerîla ji demekê ve ye li herêmê tê zanîn. Bavê Ferhat Tepe, serokê DEP'a Bilîsê İshak Tepe, da xuyan ku ew dengê di telefonê de pirr dişibe yê qumandarê Tûgaya Tetwanê Korkmaz Tağma û berpirsiyarê vê revandinê ew bi xwe ye.


Peymana Lozanê nelê ye

bê sîcdarkirin. Yvette Jaggi axaftina xwê wiha domand: "Welatên ku Kurdistanê parve kirine, bi zanebûn tevger kirene. Di wê demê de gelê Kurd, li ber çavêñ dinyayê hate parçekirin û bi tunebûna ji rûyê dinyayê rû bi rû ma. Di dema ìmzekirina peymanê de, nûnerê Swîsreyê, yê ku beşdarî

ferans di bin serokatiya endamê Rojnamevanê Sînorînas Alaîn Millard de dest pêkir. Mebûsê Partiya Sosyalist a Swîsreyê û endamê Delegasyona Konseya Ewrûpayê Vîctor Ruffy, rojnamevan-nivîskar Chrîstiane Maure, Serokê Yekîtiya Hiqûqvanê Kurd Î.Şerîf Vanli, Serokê Komele-

Li gor Millard, Kurd bi têkoşîna xwe ya ji mêj ve, vê çarenûsiya xwe ya xerab vegerandine.

Pişti Millard, Mebûsê SP'ya Swîsreyê û endamê Delegasyona Konseya Ewrûpayê Vîctor Puffy axaftinek kir û xuyand ku pirsgirêka Kurdî, ne pirsgirêkeke hundirîn ê dew-



Nûnerêñ dewletên ku Peymana
Lozanê ìmze kiribûn di wêne de bi hev re têñ dîtin. 24 Tîrmeh 1923, Lozan, Swîsre

konferansa Lozanê bûbû, pesnê bîryarêñ Lozanê dabû. Lî dibe ku ev ji safbûna wî, an jî, ji nezaniya wî ya encama vê peymanê ya li ser gelê Kurd be. Lî di pêvajoya îro de, ji jana ku gelê Kurd kişandiye derketiye holê ku, ev peyman rû-reşıya dinyayê ye."

Konferansa li Lozanê, di salvegera 70 saliya vê peymanê de pêk hat. Ji gelek hêlan, hejmarek zêde mirov beşdarî konferansê bûn. Kon-

ya Mafêñ Mirovan ê Diyarbekir û Cîgirê Serokê Giştî Sedat Aslantaş, li ser navê ERNK'ê Ali Sapan û ji rîexistinêñ hemû-parçeyen Kurdistanê axivkar beşdarî konferansê bûbûn.

Ji Yekîtiya Rojnamevanê Sînorînas Alaîn Millard, peymana Lozanê ji bo Kurdan mîna bextreşiyek (bêsiûdiyek) herî nebaş nirxand û piştgiriya têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê wek deyndariyeke mirovahiyê pêşkêş kir.

letên ku Kurdistanê parve kirine ye. Lî divê ne Konseya Ewrûpayê, Neteweyen Yekbûyî li vê pirsgirêkê xwedî derkevin. Puffy axaftina xwe wiha domand: "Divê Tirkîye rûmetê bide mafêñ mirovan. Divê işkenceyên ku li ser gelê Kurd têñ meşandin rawestin û Tirkîye li gor peymanê navneteweyî ku wê bi xwe jî ìmze kirîye bilive."


Vîctor Puffy xuyand ku, dê tewra Ewrûpayê ya li hember

Tirkîyê, pişti Konferansa Pirsigirêka Kurdî ya Navneteweyî, demokrasiya li Tirkîyê û Pirsigirêkê Hindikahiyen bê kîşkirin.

Serokê Komeleya Mafêñ Mirovan a Diyarbekir Sedat Aslantaş, Mustafa Kemal Ataturk, bi xapandina Kurdan sîcdar kir û rewşa wê demê berbiçav kir. Sedat Aslantaş, axaftina xwe wiha domand: "Politîkaya înkariyê yê ku ji 70 salî ve tê meşandin, êdi iflas kiriye. Li derive tê gotin ku, li Tirkîyê leşker bi gotina siyasiyan nakin. Ev ne rast e. Serê hemûyan yek e, lê kîncê wan cihê ne. Niha li Kurdistanê, bi hezaran gerîla û milîs şer dikin. Bi hezaran kes di vê riyê de mirin. Êdi dewlet tola xwe ji sivîlan hildide. Statuya ku di Lozanê de hatibû kifşkirin, iro di pratîkê de parce bûye. Niha dixwazin, rojnameya Özgür Gündemê ku çav û guhê xelkê ye bigirin.

Li ser navê ERNK, KAWA, PDK-Îran, PSK û YNK'ê ji axaftin hatin kiran û nûnerêñ van rîexistinêñ rexne li peymana Lozanê girtin. Li ser navê ERNK'ê Ali Sapan wiha axivî: "PKK bi şerrawastina xwe ya ku di 20'ê Adarê de îlan kîrbû, niyepakiya xwe nîşan da. Em ne evîndarê şer in. Lî ji bo em bigîhîn hedefen xwe yêñ politîk, mecbûr in şerê xwe bidomînin. Ji bo çareseriya vê pîrsê, divê mafê çarenûsiya gelê Kurd a bi destê xwe, bê nasîn. Emê ji bo bigîhîn vê armancê, bi piştgiriya gelê xwe, di hemû riyên meşrû de têkoşîna xwe bidomînin."

Konferans, bi danezaneke ji 15 madeyan pêk hafî qedîya. Madeyên danezanê bi giştî li ser protestokirina dewletên dagirker, bangêñ ji Neteveyen Yekbûyî (NY) re û piştgiriya xebatêñ yekîtiya hêzîn Kurd hatine avakirin. Li aliyê din, naskirina Dewleta Federe ya Kurd ji dewletên cîhanê tê daxwazkirin.



Ferhat Tepe

de û çapemeniya Tirk de mîna endamê "rîexistina terorê" hate pêşkêşkirin.

Yekgirtin tevî PDK'ê bû

Navenda Nûçeyan- Di navbera partiyen Yekgirtin û PDK'ê de, peymana yekbûnê hate ìmzekirin. Peyman li bajarê Selahaddin, ji aliyê serokê PDK'ê Mesut Berzanî û Serokê Yekgirtinê Samî Abdurahman ve hate ìmzekirin. Xebatêñ yekîtiya herdu partîyan, ji demekê ve didomian.

Li ser peymana yekîtiya herdu partîyan, Serokê PDK'ê Mesut Berzanî daxuyaniyek da û vê yekîtiyê mîna destpêka demeke dîrokî nirxand. Li gor vê peymanê navê PDK'ê hate guhertin û bû PDK-(Yekgirtin).

Partiya Yekgirtinê di Tebaxa 1992'yan de bi Yekîtiya Partiya Sosyalist a Kurdistanê Iraqê, Partiya Gel a Demokratik a Kurdistanê, Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PASOK) hatibû avakirin. Yekgirtin ji destpêka vê salê ve ji bo tevî PDK'ê bibe, di nava xwe de guftûgoyan dikir. Ji partiyen ku Yekgirtinê ava kiribûn, PASOK ji partiyê vejetiyabû û tevî YNK'ê bûbû. Serokê PASOK'ê Resûl Mamed tevî hêza xwe niha di nava YNK'ê de ye.

Dê Kongreya PDK'ê ya mezin di 16'ê Tebaxê de pêk we're.

PÊNÛS

Amed Tigris



Li Kurdistanê şova fîlan

Di roja 20.7.1993'yan de Serokwezira Tirkîyê Tansu Çiller di TV'ê de axavtinek kir. Axavtina wê ji sedî sed kopya axavtina Turgut Özal bû. Çend sal berê Turgut Özal li ser kursiyê xwe rûdiniş, pênûsek digirt destê xwe û ji Tirkan re nituq didan. Tansu Çiller di şûna pênûsa Turgut de berçavika xwe girtibû destê xwe. Ha Turgut ji kopiya Serokê Amerika Bush dîkir. Yanî Tansu hîn kopya kopiyan e.

Min ji destpêkê heta dawî bi awayekî baldar temaşe û guhdariya Tansu Çiller kir. Naveroka axavtina wê, ez dikarim wiha bi kurtahî bîdim: Xatûnî bi duayan dest bi axavtina xwe kir. Pişt re dest bi xwendîna merşâ neteweyî ya Tirk (İstiklal Marşı), Sonda Tirk (Andımız) û bi Xîtabeya Ey Ciwanê Tirk (Ey Türk Gençliği) domand. Di dawîya axavtina xwe de ji, dest bi tirsirandin, fort, nifir û çêrén nemayî ji gelê Kurd re kir.

Ên ku temaşe kirin dîtin ku, bi rastî Tansu Çiller ne wekî profesorekê û ne ji wekî serokwezirekê diaxiviya. Wekî keçikeke 17,18 saliya liseyê ku nîvîs dane dest û dixwîne, monologa xwe dixwend. Monologa ku 70 sai in her tim tê xwendin. Monologa ku bi nîjadperestîya Tirk dije û bi bîhno û kufikbûy... Vala û pûc...

**Gelo di nav du rojan de
ci hat serê fila qehre-
man? Ka ordiya fil bû û
mêş nikaribû bi filê?
Gelo mês pê veda û fil
cehemî, ci bû? An ji
Tansu Çiller tişteki nû
keşf kir. Dît ku Cû-
lemêrgî, Şîrnexî, Batma-
nî û Amedî bi Tirkî ni-
zanin. Ji ber vê yekê li
wîr ew xapand û got ez
dê 2.5 trilyon ji we re
xerc bikim. Lî hat Enqe-
reyê vî pereyê ku soz
dabû wan 7.5 trilyonê
din ji kir ser.**

"Em miletetik 60
milyon in. Me keç da-
ne hevdu. Ez hatime riyên we asfalt bikim. Meydana topê ji we re
çebikim. Kredî bidime we ku hûn heywan xwedî bikin. Xaliyan çebi-
kin. Ji bo vê yekê ji min ji we re, ji butçeya xwe 2.5 trilyon pere vege-
tandiye. We ji destê terorê xelas bikim... Dewlet mezin e wekî fil e.
Terorist ji wekî mêsne. Mês tu carî nikare bi filê..."

Jînîn cehşan anîn û destê Tansu Çiller ramûsan. Bi kurtahî Tansu Xanimê bi cilûbergân xwe yên spî û bi boyaxa xwe ve, li Cû-
lemêrgî şov dîkir. Heqê axavtîn be tenê ji Tansu û halêvan wê re hebû.
Ji xelkê re tune bû. Heqê xelkê ê temaşekirinê hebû. Her yekê bi
çav û nyiyeteke cuda li Tansu Çiller temâse dikir. Bersiva herî baş
rêxistinê bajarê Cûlemêrgê dane Tansu Çiller, wezir û generalen
wê. Hemû rêxistinê partîyen legal (ANAP, RH, DEP, SHP, CHP...) bi
hevdu re belavokek amade kirin dan destê xanimê. Di belavoka
xwe ya hevbeş de digotin:

"... Em hemû dixwazin rojekê zûtir, esker û tîm ji herêmê derbiken.
Cehşen çekdar (parazgerên gundan) çekên xwe deyîn û bêñ
belavkirin. Rêxistina kontrgerîla eşkere bibe û sücdar bêñ cezakirin.
Rewşa awarte ji herêmê rabe. Sansura ku li ser rojnameyan heye,
bi la nemîne. Hikûmet divê ji dialogên Kurdan re vekirî be. Doza Kurd
bi awayekî azad bê munâqşekirin. Divê di Radyo, TV û dibistanan
de Kurdi dest pê bike..."

Her wiha planê Tansu û general kete avê. Moralê wan ket bin si-
firê. Vê helwesta gel ji raya giştî veşartin.

Li Şîrnex, Batman û li Amedê ji Tansu eyîn monologa xwe xwend.
Xelkê lê temaşe kir. Guhdarı kir.

Roja sisêyan Tansu bi heyeta xwe ve vegeeria Enqereyê. Press-
konferansek çekir. Digot ku: "Em bi artêşa (ordiya) xwe ya hazir nikarin
bi terorizmê re seri derbixin. Divê ji komandoyan artêşeye taybetî
çebibe. Ev artêşa profesyonel inçex dikare bi wan re şer bike. Em
dixwazin ji bo vê yekê 10 trilyon pere amade bikin. Di demeke pirr
nêzîk de em dê bingehê vê artêşê biavêrin..."

Gelo di nav du rojan de ci hat serê fila qehreman? Ka ordiya fil bû
û mês nikaribû bi filê? Gelo mês pê veda û fil cehemî, ci bû? An ji
Tansu Çiller tişteki nû keşf kir. Dît ku Cûlemêrgî, Şîrnexî, Batmanî û
Amedî bi Tirkî nizanin. Ji ber vê yekê li wîr ew xapand û got ez dê 2.5
trilyon ji we re xerc bikim. Lî hat Enqereyê vî pereyê ku soz dabû
wan 7.5 trilyonê din ji kir ser û ji komandoyan artêşekê çedike û bi
ser wan de bi rê dike? Dibe ku dengê Tansu Çillerê ji Tirkîyê neçe
Kurdistanê! Kurdistan hem çiya ye û hem ji geleki dûr e...

Trajedî-drama-romantîzm

Gavan Koçer

Şam, Suriye, yekşema meha Ni-
sana 1984'an. Li taxa Muhaci-
ran, li mala Mîr Celadet Bedir-
xan penaberekî Kurd, Ehmedê
Fermanê Kîkî. Ehmedê Ferman
bilûrvanê hêja li stargeha xwe li
ser kursiyekî bicûk rûniştiye, li
ser bûyerên borînî difikire.
Serpêhatiyen borînî wek; jihev-
ketina welatê Kurdan, Kurdistan,
têkçûyîna serhildanen 1925,
1928, 1930'an, di van serhildanen
de bi milyonan mirin û pelçiq-
qandina kesen Kurd, qedexekirina
zimanî Kurdî, jiyana Mîrîn
Botan û derxistina kovara Ha-
warê, dengbêj û stranvanê mezin
Evdalê Zeynikê. Rewşa bilûrvanê
ne baş e. Ew li dînyayeke din
wek penaber ji her tişî dûr bêri-
ya welatê xwe dike. Di vê dînyâ
nû de ew bi çîroka Evdalê Zey-
nikê û mîstîka Ciwayê Sîpanê ve
mijûl e.

EVDALÊ ZEYNİKÊ Û CIWAYÊ SÎPANE

Li kéléka gola Wanê bi navê
Ciwayê Sîpanê, ciwayek bilind di-
be. Ev ciya bi mîstîkan tije ye. Bi
hezar salan ji gelê Kurd re bûye
war û stargeh. Lehengê romanê
Evdalê Zeynikê, ji malbateke be-
lengaz û zixan tê. Dengbêj e.
Dengekî xweş li ser e. Ew deng-
bêj û stranvanê civata Tahar Xan
e. Tahar Xan mîrekî Kurdan û
dewlemed e. Evdal di dawet û
dîlanan de bi dengbêjîya xwe ci-
vatê geş dike. Lî çerxa felekê lê
çep geriyaye. Edî rojîn kîf û şâ-
hiyê nemane. Halê Evdal ne hal
e. Gelek tiş li wî û malbata wî
qewimîne. Rojîn gîran û bi ke-
der di ser re hatine. Di vê çarço-
veyê de pirtûka Uzun wek ku di
şekla çend nameyan de be, hatiye
nîvîsandin. Her nameyek bi
serpêhatiyekî nû ve hatiye mû-
nandin. Di navçeya her nameyek
de rûniştiye lehengê romanê û
serpêhatiyen xwe pêşdar
dike.

Evdal di roj û demen bi keder
û keser de xwe dîkişne qûntara
Ciwayê Sîpanê ya bi mîstîkê û li
ser filosofiya hebûn û jiyanê dihi-
zire. Bi dengê xwe yê delal ax û
lorîn dike; ji vê ax û lorînê ji hêz
digire, ji nû ve vedije:
"Wey li min felekê,
Felekê, te cîma li min wiha kir?
Te kumê xwe li min xwar kir,
Korbûna Evdalê Zeynikê, kalbû-
na wî li dinê, ji xwe re Feyde û
kar kir."

Wekî din ew keserkûr û dilgi-
ran e. Dinya wî reş e. Serpê-
hatiyen wî yên xedar wek; korbûn,
bêhêzî û belengazîya wî, mirina
dengbêj Biro, qetilkirina Bengîn
û Meyro ku emanetê wî bûn, di
bin perrîn wî de bûn, zilm û zor-
dariya Osmaniyan, nakokiya E-
gîd Begê malmîrat, bi wî xayıntî-
ya felekê didin tesdikkirin.

Lê gelek caran ji şahî û xem-
gînî bi hev re, tenîş bi tenîş di-
jin. Dîlan, girîn û kelîn bi hev re

ne. Ev yek dra-
maya gelê Kurd
bi xwe ye. Di a-
soyên bêdawî de
d r a m a y e k e
bêdawî.

SEMBOLA RINDÎ Û ASTIYÊ

Evdal mirove-
kî xemgîn û
xwedî ramanen
rindiyê ye. Ew
nerindî û şer
naxwaze. Astix-
waz û alîkar e.
Neyartî û dijitiya
navneteweyan
naparêze. Mala
xwe kiriye mala
nekes û neçar-
an. Ew bûye
sembola rindî û
rastiyê. Birayê
rojîn teng e.
Bargiran e. Mala
xwe kiriye mala
bêkes û neçar-
an. Ji kîjan ne-
teweyî dibe bila
bibe, derî vekirîye. Biro, Bengîn,
Meyro, xwendevan û hwî. Edî
bûne ji mala wî parçeyek. "Kur-
dino, qasit bêzêwîl e. Ez deng-
bêj xelkê me. Mekine, Ermenan
mekujine. Ermen pismam û ci-
ranen me ne. Guh medine xedâr
û mîrkuj bê nan û xwê ne",
dibêjî Evdal li dijî mirovkuj û
hêzen tarî.


HÊZEN TARÎ Û CIWAYÊ ŞENGALÊ

Hêzên nerindî û bela bi navê
Kor Reşid Paşa, Pala Osman û
berdevkê wan Egîd Beg hatine
nûnerandin. Wek dramayeke
sêgoşe. Herçî nerindî, xerabî, rû-
reşî, bêbextî, fêlbazî; bi navê ne-
başiyê ci heye ew temsîl dîkin.
Plana xwînrijandinê ji hêla wan
ve tê amadekirin.

Li vir kesanetiya Egîd Begê
bala mirov dikişine. Kesanetiye-
ke bêprensib û rûxandî ye. Li ser
xwe nîzane bifikire. Raman û
mejiyên wî wek robotan di destê
Kor Reşid Paşa de ne. Egîd Beg
ji kesen neçar û belengaz re hût
e, lê ji yên bi hêz re pişik e. De-
ma dîbihîze ku Meyro û Bengîn li
ba Evdal in, dîn dibe, çav xwîn
digirin. Ci ye? Ji Evdalê kor û kal
ci dixwaze? Hêza ku Osmaniyan
wek nobetdarê xerabiyê dabûn
wî, ew kor kiribû.

Hêzên tarîtiye li dû reşandina
tovê neyartiyê ne. Neyartiyâ
biran. "Egîd Begê, Egîd Begê...
Mîr be, mîr. Ji bir meke, destê
dewleterê dirêj e, bi her cihî digi-
he... Bi her tişî dîbihîse. Ew
sêwiyen ku tu li pey i, li Ciwayê
Şengalê, li nik êzidiyan in... Ezidi
dîsan ders û koteke dixwa-
zin...", dibêjî Kor Reşid Paşa û
bi vê yekê ji Egîd Begê kişîşa
ser Ciwayê Şengalê dike.

Li Ciwayê Şengalê, war û star-
geha Kurden êzidiyan, li newala
Laleşê -newala pîroz- ji tofana



Berga romana 'Rojek ji Rojîn Evdalê Zeynikê'
çapa duyemin 1992 Stenbol, Weşanen Doz

Egîd Beg û Osmaniyan nafelite.
Her der tê rûxandin. Mizgîneke
reş digihe Evdal. Ji dînyê koçkiri-
na evîndarîn biharareş, Bengîn
û Meyro. Dawiya romantîka ber-
fa zivistanê Bengîn û sorgula bi-
harê, Meyro hatiye. Trajediyeke
mezîn e ku li Ciwayen Şengalê û
Sîpanê qewimî ye.

QELSI

Romana Uzun bi trajedî, dra-
ma û romantîkê ve tije ye. Uzun
bi zimanîkî zelal û awayeke a-
hengxwes û herîkî romana xwe
şîrov kiriye û xemilandîye. Rihê
şairiyê ciheke gîran digire. Lî li
gor min gîranî pîri li ser xemilan-
din û tasvîrê ye. Wer ku mirov ji
tasvîrê pêşîra xwe xelas nake.
Tasvîrê bûyer û naverok fetisan-
dine. Nehîste naverok û bûyer
di navçeyê de cihê xwe bigirin.

Jîyana penaberiyê, his û xe-
yalen dînyayekî nû û biyanî hel-
bet bandoriya xwe dihîlin û dikâ-
rin diltepîneke mezin biafirîn û
tesîrê li hunerê bikin. Lî his û ra-
man divê bi jiyan û pêkhatînên i-
royîn ve paralel herin.

Helbet hînbûna dîroka me gi-
ring e. Lî jîyana çûyîn û ya iro-
yîn dikarin bi hev re ji bîn mû-
nandin. Hêvî ew e ku, nîvîkarîn
me zêdetir bi bîr û baweriyeke
xurt, bi zamîneke baş, bi mijarîn
nû ve mijûl bibin. Bibin derd û
êşen civat û xwendevanen xwe.
Generesyonen ve demê bigirin
ber çavan. Ê xwendevanen hêvi-
yekî ye. Em dixwînin û dipirsin.

Bi qelsî û xurtiya xwe ve ro-
mana "Rojek ji rojîn Evdalê Zey-
nikê" romaneke hêja ye û ya
xwendinê ye. Nîvîkarî di xebatîn
xwe de xwendî serkeftin û serfirâ-
ziyey e.

Mehmed Uzun: "Rojek ji
rojîn Evdalê Zeynikê", Roman
Weşanen Welat. 1991,
rûpel 164.

Lêgerînek li ser rewşa helbest û helbestvan li Kurdistanê

Zahîr Kayan

İro li Kurdistanê şer û cengeke dijwar didome, her wiha li gorî vê rewşê di nava ji-yana gel de jî bi çand û wêjeya biyanî re şerekî mezin berdewam dike. Çanda gelê Kurd li hember çand û wêjeya kedxwaran tim û car xwe parastiye û ev bûyer dewlemendiya çand û wêjeya Kurd dide xuyakirin. Lé hezar heyf û mixabin gelê Kurd ji ber hinek sedeman di navbera hinek dugelên (dewlet) hov de hatiye parvekirin û hencirandin. Ev bûyer bûye bela serê gelê Kurd, bûye sedema qelsbûn û jarbûna çanda gelêrî û hemdem. Hinek helbestvanen Kurd xwe parastine, ji bo hinek dewlet û siltanan helbest afirandine. Ji van keisan yek jê İdrîs-i Bîdlîsi ye û navê berhemâ wî "Heşt Bu-hîst" e. Hemû hunerên xwe ji bo neyarar xerc kiriye û bûye serhozanê zordaran. Di nav axa û begên Kurdistanê de tu car yekîtiyeke mezin xwe nedaye der û ev

elamet bûye çoleke koledaryê ya li ser Kurdistanê. Ev bûyer di pirtûka Şerefjan ya bi navê "Şerefname" de xwe beyan dike. Lé wisa jî egîti û lehengiya beg û axayên Kurdistanê yên jîr jî tê ziman. Em ku Kurdologê mezin û hêja Qanatê Kurdo û pirtûka wî ya bi navê "Tarîxa Edebiyatâ Kurdi" bidin ber destê xwe û lê mîze bikin emê vê rewşê jî bibînin ku, li hember sîtemkariya Osmaniyan û Farisiyan serekê Kurdan di Kurdistanê de gelek berhemên pîse û mîmariyê da-ne û Kurdistan kirine cihêñ çand û medeniyetê. Ev rewş di Seyahatnameya Ewliya Çelebî de jî xwe dide xuyan. Em di pirtûka Qanatê Kurdo de, zanebûn û dîtinê Kur-dologê Rûsyayê yê hêja û mezin Aleksandır Jaba hinek tespîten hêja dibîn. Der heqê wêjeya Kurdi ya bi niviskî de Aleksandır Jaba nimûneyen hêja ji me re anîne ber çavan. Aleksandır Jaba pirtûka xwe ya navê "Recûl de notices et recits Kurdes" de, der heqê Eli Herîri,

Em bala xwe didinê helbesten me hêdî hêdî dikevine rîyeke rast û bi awayekî serbest rewşa civakê û pirsgirêkên wê tî-nin zimên. İro têkoşîna gelê Kurdistanê bi giştî li ser pişta gundî û karkeran e, pêwist e ku nirxandina vê têkoşînê bi helbesten nûjen û hemdem ve bêñ bersivandin. Her wiha girîng e ku helbestvanen Kurd çavêñ xwe li hemû dînyayê vekin û wêje û çanda gelê dînyayê û berhemên wan ên klasik û nûjen bikolin.

Melayê Cizîrî, Meleyê Batê, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, İsmâîl Bazîdî, Şerefjan û Mûradxan de melûmaten hêja henin. Em bi tespîten A. Jaba ve dizanin ku, di esra (X) û (XI)'an de wêjeya Kurdi bi niviskî hebûye û pirr dewlemend bûye. Bi nîvîsara Eli Herîri helbestek:

Dîsa jî nû eşqa berê
Pîrr anderûn im ateş e
Zulfa muzyean enberî
Dawa di gel xala reş e.

Qanatê Kurdo dibêje ku, di vê esrê de (X-XI) bi Kurdi ewqas paqîj helbest hatîne nîvîsandin, lê ev helbestan i-ro jî hemdem in, bi zimanê Kurdi yê niha ve wekhev in. Ev rewş di zimanê Tirkî û di berhemên wan i di wê esrê de (X-XI) tun in. Tirkîye di esra X. de wek Tirkîyea niha nîn e. Ev bûyer dewlemendî û kevnaretiya zimanê Kurd dide beyankirin. Ji wê demê ta niha di nav gelê Kurd de gelek helbestvanen hêja derketine û hinek berhemên giranbuha afirandine û nav û deñgê wêje û çanda Kurdi li cîhanê xistine. Ji van kesan Pertev Begê He-karı, Şêx Xalid, Sîyapûs, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Kur-di, Şêx Riza Telabanî, Edeb (Mîsbahul Dîwan), Wefayî, Xeriq, Bêhûd, Sebrî, Selam, Salim, Qane Muzher, Ahmet Mixtar, Beg, Pîremêrd, Eb-dula Gurân, Dildar, Bêkes, Hejar û hwd. Ev helbestvanen han bi pirrani li ser serxwebûn û rizgariya welat helbest afirandine. Lé di van helbestan de nimûneyen klasik xwe didin xuyakirin. Her wekî ev helbest bi rê û rêça wêjeya dîwanê ve pêk tîn. Di van helbestan de dîsa qafîye û beyît xwe bi quwet didin nîşankirin. İro jî hinek helbestvanen me yêñ hemdem bi rê û rêça "Wêjeya

ke nû derxistin holê, ev bûyer rexnegiriyeke mezin li helbesten Nazim jî dikir, her wiha serhozanê vê helbesta nû Orhan Veli bû û navê şopa xwe danîbû "Garîp". Ev helbest hemû xisleten Wêjeya Dîwanê ji holê radikir û rola helbestan dixiste ser têkoşîna proletaryayê û wêneyeke civakî û sosyalojik jê derdixist. Em wisa jî bo wêjeya Kurdi dixwazin ku helbesten me jî ji bin bando-ra Wêjeya Dîwanê derkevin û bikevine rîyeke nû û nûjen. Carina di rojnameya Welat û di kovara Rewşen de hin helbesten hevlbestvanan têñ çapkîrin, em bala xwe didinê, ev helbest serbest hatîne nîvîsin û ev tişteki xwes e. Dixwazim mînakî bidim, di rojnameya Welat de helbesteke helbestvanen ciwan "Xamevan" bi navê "Serfirazî" hatîbû weşandin ji wê helbestê mînakî:

Ez duhî li Diyarbekirê Şêx Seîd bûm
Li Dêrsimê Seyîd Riza bûm

Li Mehâbadê Qazî bûm
İro jî li zîndanen Amede
Xeyrî me, Kemal im,

Akîf im, Çiçek im...

Em bala xwe didine helbesten me hêdî hêdî dikevine rîyeke rast û bi awayekî serbest rewşa civakê û pirsgirêkên wê tîne ziman. İro têkoşîna gelê Kurdistanê bi giştî li ser pişta gundî û karkeran e, pêwist e ku nirxandina vê têkoşînê bi helbesten nûjen û hemdem ve bêñ bersivandin. Her wiha girîng e ku helbestvanen Kurd çavêñ xwe li hemû dînyayê vekin û wêje û çanda gelê dînyayê û berhemên wan ên klasik û nûjen bikolin.

Çavkanî:

Çağdaş Türk Şiir Antolojisi (Mehmet Fuat-Adam Yayınları)


Edebiyat Üzerine Düşünce-ler (T.S. Elîot)

Tarîxa Edebiyatâ Kurdi (Qanatê Kurdo- Weşanen Roja Nû)

Dîvan Şiiri (Özcan Türk-XIII, XVI yy)

Şerefname (Şerefjan)

Rohat-(Kürdoloji Bîlimînîn 200 Yillik Geçmişî-1787-1987)



Hîn bêhtir tûj binêr xwarzê! Kê birayê te bi girî vekir? Kê pêlava wî, ji piyê wî derxistibe û ew xwas hişibe, neyarê te ew el! Wa ye gepek nan di destenê wî de maye... Şiyar be! Çavê wî neyarî li wê gepa nanê jî, çawa ku pêlav biriye wê bixwaze ku nanê wî jî, jê bîstîne. Tu li ber têkeve kozikê û wan awirêñ xwe, ta ku ew diz û keleş li derdora we bin, sist meke. Min li te tembil! Jî bîr meke!

î. Xort

Führerên KT'ê pirr in; Almanya li Führerekî digere

Nihat Dirêj

Zanyarê politikayê û doxtorê giyanî Wilhelm Reich di pirtûka xwe ya "Analîzén li Ser Giyana Faşizmê" de (1933) wiha dibêje: "Demokrasiya kedê hetanî di ramana civakan de cih negire û belav nebe, mîkroba faşizmê ji jiyanâ civakî paqî nabe. Dewleta sermayedar ger çiqas ji xwestina azadiya giştî re bibe asteng, mejj û ramanen mirovatiyê bi ideolojiya xwe ya nîjadperestî biço, civak ewqas ji faşizmê re amade dibe. Di vê rewşê de her tim talûkaya derketinê Hitler heye..."

Di ser van gotinê W. Reich de kêm zêde 70 sal derbas bûn. Di vî 70 salî de li cihanê geleb bûyerên mezin, jiyanâ civakî serûbinê hev kir. Sermayedarên Alman bi alîkariya SDP (Partiya Sosyal-Demokratên Alman), çepen Alman ên wê demê civaka Alman ji faşizmê re amade kirin. Almanya ji ramanen mirovatiyê dûr ket. Di vê rewşê de pîskopatek wek Hitler derket û bi hêsanî civakê li dor xwe civand, bi milyonan Alman ji armancêna faşizmê re kir alet. Almanya Hitler bi tevi sistêma împerialist re bûn sedemên Şerê Cihanê ya Duyemîn. Cihan bi xwînê hat şüştin. 50 milyon mirov hate qetikirin. Çar ewqas seqet, birîndar, nexweş man. Cihan xelâyî derbas kir. Ji vî şerî yek aliyeke tenê feydeyeke girs (mezin) dît. Ew ji sermayedarên navneteweyî bûn... Li ser Şerê Cihanê ya Duyemîn heta iro bi hezaran pirtûk hatin nişandin. Lékolîn û film hatin çekiîrin.

Li ser encamên Şerê Cihanê ya Duyemîn bêhtir ji me re rewşa iro, têkiliyêne dewleta Alman û Komara Tirk pêwist e.

Wek tê zanîn burjûwaya Alman sermayedareke împerialî û navneteweyî ye. Di herdu şerî cihanê de Almanya xerabûyî zû ava bû. Di parkirina cihanê de para xwe girt û di demeke kin de bi alîkariya Amerikayê (Dewletên Yekbûyî yê Amerikayê), planên Marchall car din rabû ser piya. Burjûwaya Alman iro li ser van bingehan û bi zêrîna (kedxwariyê) kedê bilind dibe.

Piştî şasî û belabûna burokraziya Sovyetê, durûtiya "demokrasi" ya împerialî listika wan a bi mafan mirovati û qerekterê zagona wan a navneteweyî bi zelalî derkete holê. Heta niha di bin navê şerî sar de van taybetên xwe yên durû vediştarin.

Dolar û Mark burokraziya Sovyetê bi awayekî erzan kirin. Pêvajoya şerî sar qedîya. Ji vir wê de, dê çiqas bikaribin demokrasiya xwe ya rizi û genî bidomînîn? Salen pêsiya me dê nîşan bide...

Sedernênu ku dozeke dîrokî ya dewleta Alman bi Sovyeta kevin re hebû, di pêvajoya şerî sar û hilwesandina "Sosyalizma Reel"

de rola mezin Almanya hilda ser xwe. Sermayeya Alman pêsi Rojhilatê Almanyayê daqurtand. Almanyaya Yekbûyî çêbû (1989). Dû re riya aboriya Alman ji hemû welatên Rojhilatê Ewrûpayê re vegeb. Sermayeya Deutschland Bank, Volkswagen, Kurpp, Mercedes-Benz û wekî din di Polonya, Çekoslovakya, Macaristan, Yûgoslavayê de niha %20-30 cih girtine. Ev firehbûn û xurtbûna Almanyayê wê bêlec, di nav împerialên Ewrûpayê de xistiye cihekî serkêş. Di biryaren Konferansa Hevkari û Ewlekariyê Ewrûpayê de (KHEE) serkêşya Almanyayê vekirî tê xuyan.

Çinayeta sermayedarên Alman rola xwe ya 1933'yan iro car din dilize. Para' ku ji Sovyeta kevin hilda ji bo ku, di zikê xwe de baş bikaribe bihelîne û ji reqa-beta Dewletên Yekbûyî û Japoniyâ bi serfirazî derkeve dîsa gira-



Duceye İtalyan Mussolini

nî dide ser nîjadperestiyê. Li Almanyayê ji faşizmê re roj bi roj revedibe.

Hildana serkêşya Ewrûpayê pirsgirêkên dewleta Alman hin zêde kir. Hejmara bêkaran gihîştiye 5 milyonî. Dû evqas ji bêxanî hene. Nêzîkî 2.5 milyon serseriye kuçan hene. (Serkîş, eyyaş, eroğan Alman ji van re dibêjin Pennar) Tenê ev pirsgirêkên han qirîjîya împeryala Alman bi zelalî derxistiye hole.

Li gor istatistikian 6 milyon binanî li Almanya dijîn. (Di nav van biyaniyan de, 2.5 milyon Tirk, nêzîkî 500 hezar ji Kurd dijîn) Rejîma Alman pirsgirêkên biyaniyan ji problemen xwe yên aborî re sedem nîşan dide. Li dijî biyani û penaberan zagonen nû tê derxistin. Wek destpêka dijmintiya Yahûdiyan, iro ji dijmintiya biyaniyan bilind dibe... Ji bûyera bajarê Rocstok (pansiyonên pena-bera hatibûn şewitandin) vir de roj tune ku xaniyek neyê şewitandin. Çend roj carek biyanîkî tê kuştin. Civaka Alman êdî biyaniya qebûl nake. Di her hilbijartîne de li Almanyayê partiya Neo-Nazî (Nazîyîn Nû) REP (Partiya Komarî) dengen xwe bilind dike. Di eyaletên Bayiera, Saksonya Jér, eyaletên Rojhilat û Navenda Almanyayê de dengê REP'ê %11-16 nîşan dide. Di hilbijartîna 1933'ê de dengê Hitler ku li Almanya girt %35 bû. Vê hej-

marê em bidin ber çav, dengê REP'ê ne reqameke biçük e.

Livbaziyan li dijî biyaniyan (xanî şewitanndin, kuştin, lêxistin) serzelütên (dazlak) REP'ê, xorîn Neo-Nazi pêk tînin. Serzelütên Neo-Nazi sùxteti dikin. Ji yekbûyîna Almanyayê (1989) heta iro li dijî biyaniyan 4000 livbazi hatiye çekirin. Rejîma Kohll ji van livbaziyan re çav digire. Civaka Alman piştgirîti dide. Hilma faşizmê ji Al-




Führer Alman Hitler

manyayê tê. Alman li Führerek digerin. Führer bê ditin, sibe car din rep repa potînan e. Wey delîl li halê we biyaniyan ku li Almanyayê bimîne!

FÜHRERÊN KT'Ê PIRR IN MAMOSTEYÊ FAŞİZMÊ KT YE!

Adolf Hitler di resepsiyona (dawet) a salvegera 50 saliya xwe de ji serbalyozê Komara Tirk (KT) re wiha dibêje: "Duçe Mussolinî şagirtê Mustafa Kemal ê yekemîn e, ez ê duyemîn im." Hitler li gor ehmeqiyen xwe carina tişten rast jî gotiye... Qesasên Kurdistanê M.Kemal, İsmet Paşa û generalên Romê gelek caran ji Almanyayê re mamosteti kirine. Gelek caran ji bûne şagirtê Mussolinî, Franko û Hitler. Pêwendiyen Komara Tirk û



Şewirmendê faşist Atatürk

mara kemalist dûvîkê Almanyayê bû. İsmetî Kerr bi fenektiya xwe û destê biratiya Hitler, Tirkîye ji Şerê Cihanê filitand, serbazan (subay) Hitler di sazkirina artêşa mîtinger a Komara Tirk de rolên girîng hildan ser xwe.

Ji pêwendiyen van herdu dewletan heta iro li cihanê gelek tiş hatin guhertin. Pêvajoyen nû vebûn. Lê Komara Tirk ji qerekter û ramanen xwe yên faşist tu tiştek neguhert. Sedemîn vê; mîtingerîya wê ya li Kurdistanê ye. Statuya parçekirina Kurdistanê ye. Rejîma Komara Tirk ji vê statuyê hêz girt, bi navê 12 Adarê û 12 İlônê du darbeyen faşist çekir. Di rejîma faşizmê de Komara Tirk xwedî tecrûbe ye. Li Kurdistanê di rejîma faşistên Komara Tirk de gelekî Führer peyde bûn. Hin ji peyde dibin. Di qirkirin, şewitandin û talankirina Kurdistanê de her generalekî kema-listen Romê Hiterek e.

Di sistêma împerialî de ji rejîma faşizmê re Komara Tirk mînakeke taybetî ye. Iro li cihanê tevgera faşizmê, Komara Tirk nûner dike. Ev taybetên Komara Tirk ji alîyê sistêma împerialî ve tê parastin û destek kirin. Artêşa Komara Tirk, li ber şerî azadiya Kurdistanê, bi alîkariya çekêne Dewletên Yekbûyî û çekêne Al-

Adolf Hitler di resepsiyona (dawet) salvegera 50 saliya xwe de ji serbalyozê Komara Tirk (KT) re wiha dibêje: "Duçe Mussolinî şagirtê Mustafa Kemal ê yekemîn e, ez ê duyemîn im." Hitler li gor ehmeqiyen xwe carina tişten rast jî gotiye... Qesasên Kurdistanê M.Kemal, İsmet Paşa û generalên Romê gelek caran ji Almanyayê re mamosteti kirine. Gelek caran ji bûne şagirtê Mussolinî, Franko û Hitler.

dewleta Alman pirr kevin e. Ji dema Osmaniyan heya iro dom dike. Ev herdu dewlet tim hevalbend (mutefik) û hevkarên hev bûne. Di rojê teng de çûne hewara hev. Jon Tirkêne wek Talat Paşa, generalên kemalist û faşist ên wek Eşref Bîtlîs hunerên xwe yê qetikirina gelê Kurd û Ermeniyan di aqademiyan Alman de kûr û terbiye kirine. Di Şerê Cihanê yê Duyemîn de pişvanê Hitler ê herî sadik İ.İnönü bû. Hesin û madenê Kurdistanê ji bombe û gülleyen Hitler re pêşkêş kir. Ko-

man li ber xwe dide.

ŞOREŞA KURDISTANÊ, MÎTINGERÎ Û FAŞİZMA KT'Ê JI HEV DIXINE

Pêşengê Şoreşâ Kurdistanê PKK û her gavêne wê yê dîrokî, bi hezaran şehîden şoreşâ Kurdistanê berhemên keda mirovatiyêne. Serokatiya neteweyî nirxekî bilind dide demokrasiya kedê. Gelê Kurdistanê gav bi gav bi xwîna xwe vê demokrasiyê di-parêze. Bi vê sedemê ye ku, şerî azadiya Kurdistanê bûye al, ji do-

za mirovatiyê re.

Serkeftina şerî rizgariya Kurdistanê, mîtingerîya Komara Tirk ji hev dixîne. Hebûna PKK'ê dîroka KT a faşist dîcîriyê. Yekîtiya neteweyâ Kurdistanê serokeni Komara Tirk bêçare hiştiye. Ji qorzikên xwe direvin. Hinek ji wan ji wek General Güreş, E.İnönü, H.Cîndoruk, çavêwan li revê ye. Bi van revan xwe ji çare-serkirina pirsgirêka Kurdistanê dûr dixin. Pişti her revê, şerî wan i qirêj û faşist li Kurdistanê kûr di-be. Her wiha dest diavêjin qomplô, lîstik û tevlîheviyên xwe yên kevin. Planen wan ên kevin, lîstika wan a nû; bûyera Sêwasê bû. Di qetliama planê Sêwasê de ji guhbelê KT'ê A.Nesîn û hemû dîjberen PKK'ê rola xwe pêk anîn. Tê de şik nabînim ku, ev plan serê kê wî ji digihê rejîma Alman. Lewre rîexistinê kevne-peresten Komara Tirk (Millî Görüş, MHP) li Almanya vekirî kar dikin û alîkariyê distîn. Armanca eniya dijiminê azadiya gelê Kurd yet e; rawestandina şerî rizgariya Kurdistanê ye. Jihevketi-na KT'ê, di nav gelê Tirk de car din bi cûntayê kêt artêşa faşist li piya girtine...

Serkeftina Şoreşâ Kurdistanê û bêçariya Komara-Tirk, bêdengiye Ewrûpayê rakiriye. Gelekî dewletên Ewrûpayê heta niha ku ji gelê Kurd û nûneren wî PKK'ê re digotin "terorîst" ramanen xwe guhertin. Lê dewleta Alman bêdengiye xwe hin neguhertiye. Li ser ramanen xwe yên kevin e. Pişti livbaziyan welatparêzen Kurd li ber deren balyozxaneyen Tirkîye, rejîma Alman dest bi gitina welatparêzen Kurd kir. Livbaziyan rûniştandin qedexe kir. Polisên Alman li bajare Kólln derî, pencereyên komeleya welatparêzen Kurd şikand. Dest da ser dokumanter û kovaran. Girtiyen PKK'ê 5 sal e, li Dusseldorf'e tê darizandin (mehkemekirin), 2 we latparêzen Kurd 6 heyy (meh)e li Berlin bê dadgeh gitine. Rejîma Alman ji meş û livbaziyan Kurdistanîyan re astengan derdice.

Hevkariyên mîtingerîn Komara Tirk û dewleta Alman a dîrokî û dîsâ bejn dide. Bûyera bajare Solingen miakek vekiribû ji hevkariya van herdu dosten kevnare re. Rebenen Tirk li Almanya nîzanin ku Neo-Nazi ji wan mîlyonek mirov bişewitîne Komara Tirk nikare ji dewleta Alman re tilîya xwe rake. Ew hîn dizanin ku; "Tirke bedelê cihanê ye..."

Li paytexta Swîsreyê Bernê, MİT û balyoz Kaya Toperî li ser welatparêzen Kurd gulle barandin. Xortekî Kurd hat şehîdkirin. 16 kes birîndar bûn. Ev bûyer di navenda Ewrûpayê de çêbû. Ji rejîma Kohll pirs dikim: Gelo ki "terorîst" e?.. Nûnerê 30 mîlyon gelê Kurd PKK'ân komara faşist a Tirk.

Mirovê rewşenbîr zirnê di ser orkestrayê de nabîne

H. Sevkan di sala 1966'an de li Kurdistana Başûr hatiye dinyayê û ji aliyê bavê ve sêwî mezin bûye. Ji ber pirs-girêkên aborî xwendina xwe ya bilind nekiriye. Di 14 saliya xwe de dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di 1988'an de nivîs-karî di jiyana wî de bûye parçeyek. Di bin tesîra pêşveçû-yîna tevgera rizgariya neteweyî de zedetir dest bi helbest, nivîs û listina şano kiriye. Di sala 1990'an de bi awayekî aktif ketiye nav xebatêن HUNERKOM'ê û heta iro ji bi HUNERKOM'ê re dixebe.

Bi zanîna min tu li ser gelek beşan dixebeit. Minak; nivîskar i, dengbêj i, helbestvan i û şanoger i. Tu bi giranî li ser kîjanî dixebeit?

- Ez bi taybetî helbest dinivîsim. Şaxen din jî di xebatên min de derecaya duduyan digirin. Lî ez endameki Koma Berxwedan im û yê şanoyê me jî di hundire HUNERKOM'ê de.

Nivîskar kî ye û tu çawa dirixîn?

- Nivîskar, xaleyeye di civakê de ku êş, derd, serkevîn, binkevînku civak tê de dicive û derdikeve. Mirovîkî ku gel, milet bigîri, wî bikenine, eger milet bikeve wî rake. Bi afirandêriya (yaratıcı) xwe, bi hunera xwe, bi zimanê gel, nivîskar ew e ku ji gel fêm dike û gel ji, jî wî fêm dike. Bi kurtaşî nivîskar dikare bajârên ji rojilat heta rojava bîne ziman.

Heta niha ci berhemên te derketine?

- Nêzîki 40 helbest tenê yên ku dengbêjîn HUNERKOM'ê gotine û li welat jî pirr hatine gotin. Heta iro 5 senaryoyen şano min nivîsandiye. 7 kurteçîrok û pirtûka mina bi navê "Çepîken Serxwebûnê" di nêzîk de amade ye ku derkeve.


Mîna nivîskarekî bi kurtî tu dikarı van peyvan tarîf biki? Welat, bihar, evîn, jiyan.

- Welat; nav e, çawa tiştek bênav nabe, mirov jî bê welat na-be.

Bihar; bêri ye. Evîn; wezifeya dil e. Jiyan; jiyan di nêrîna min de tenê salek e. Ew jî ne tim zivistan, ne tim Bihar û ne jî tim havîn dimîne. Sev şer dike ji bo sev be û ro şer dike, ji bo roj be.

Helbestvanen Kurd zehmetiyê ci hengê dibînîn û çima?

- Dema pê dihesin ku ji sedi kêmî deh jê fêm dike, di nêrîna min de zehmetiya mezina ku helbestvan dikişînin ew e. Sebeb jî ew e ku miletê me heya niha bi zewqa edebiyata xwe nizane. Mînak; min helbestek bi Erebî nivîsi û xwend. Hevalekî min i nivîs-



Mîna ku Kurdistan kirine Gulistan. Ew tişt helbesta Kurdî dixe talûkeye...

Di rojnameya Welat, hejmar 61'an (quncikê Hawar) de gotarek bi navê "Koma Berxwedan di navbera kevin û nû de" hatibû nivîsandin. Wek endameki K. Berxwedan nêrîna te ci ye li ser wê gotarê?

- Ez naxwazim bibe bersiv ji hevalê nivîskarê gotarê re. Lî mirov jê tiştekî fêm nake, divê li ser xeba nede. Ez bawer dikim, armanca gotarê tiştekî din bû ne mesele huneriya Koma Berxwedan di bû. Koma Berxwedan di berê de bi saz, dahol û zirne bû û bi gotinê xwe yê sloganî bû. Lî di dema niha de bi orkestra bi gotinê xwe yê edebî ne. K. Berxwedan ya niha, bi geleki ji rewşa xwe ya berê pêş ketiye.

Ew rexneya wî hevalî ne rexneya mirovîkî rewşenbîr e. Mirovîn rewşenbîr zirnê di ser orkestrayê de nabîn. Lî dibe ku ji zirneyê hez bike. Gotinê edebî nade bi gotinê sloganî û dibe mirovîkî sloganîk be. Di nêrîna min de ew nîrîna yekî ji nav milet e, ne ji nav rêza rewşenbîran e.

Tiştekî ku min nepîrsî û tu dixwazî bibêjî heye?

- Berî niha min got. Helbesta Kurdî li bakurê Kurdistanê di talûkeye de jiyan dibe. Wezîfeya hemû hunerîmend û nivîskaran ku helbesta Kurdî, muzîka Kurdî, ji wê talûkeye xelas bike û rê nedîn ticaran ku kîrîn û firotînê pê bikin. Ji bo rojnameya Welat ez dixwazim bibêjîm ku, yekemîn car e rojnameyeke wisa derdikeve. Divê ku heta dawîyê bê parastin û bi naveroka xwe bi huner be. Rojname ne cihê gotaran tenê ye, dikarin pîrî tiştan bikin. Ew "Xaçepirs" jî, ji pêncan sisê şas in. Mirov dikare hîn hêasant bike, ji bo xwendevanan. Ji bo fîrsenda hevpeyvînê zor spas dikim. Serkeftina hemû xebatkarên rojnameya Welat dixwazim.

**Hevpeyvîn:
Bêrîvana Dêrsimî**

AZADÎ



Abdurrahman Durre

Mûsa Anter û Beşîkçi

Jî Mûsa Anter ê rehmetî pirs kirin: "Gelo Îsmaîl Beşîkçi Kurd e yan Tirk e?" Mûsa got: "Bi Kurdî nizane; belê min rojekê jê pirs kir, bi navê kalikê kalikê xwe jî dizanibû. Ev jî nîşan dide ku tê de Kurdîtî heye. Lewre, Tirk bi zor navê bavê xwe dizanin. Pirraniya wan navâ kalikê xwe jî nizanin. Lî Kurd wilô nîn in. Herkes bi hindikahî heta 5 kalikê xwe jî dizane. Madem Îsmaîl bi navê kalikê kalê xwe jî dizane, miheqeq ne Tirkê saf e; tê de damareke din heye". Pirs kirin, gotin: "Apê Mûsa Tirkê saf çawan in?" Mûsayê rehmetî keniya û wiha bersiv da: "Türkeş dibêje, wekî guran in. Bi rastî jî dema mirov bala xwe rind dide Türkeş, enî û pozê wî eyîn weke yê guran in. Hûn jî rind lê mêze bîkin, eyîn gur bi xwe ye. Bi her a-wayî dişibin hev û weke hev in. Biravo! Yanî mîrik bi rastî jî gur e. Lî li gor baweriya min ew jî ne Tirk e. Lewre gelê Tirk eniya wan fireh in, pozê wan pan in, rûyê wan gi-lover in. Tirkeş wilô nîn e, poz û rûyê wî weke yê guran dirêj in, eniya wî jî wekî ya guran e, kêm ber û cincoq e. Dema dipeyîve jî, weke gurê pîr dibe kelme kelma dev û diranê wî. De bi Xwedê ew gur bi xwe ye û bi gurîtiya xwe jî iftîxar dike.

rûyê wî weke yê guran dirêj in, eniya wî jî wekî ya guran e, kêm ber û cincoq e. Dema dipeyîve jî, weke gurê pîr dibe kelme kelma dev û diranê wî. De bi Xwedê ew gur bi xwe ye û bi gurîtiya xwe jî iftîxar dike. Li Tirkîyê doza gurvaniyê wî îcad kir. Berê tiştîn wiha tilto-vîrto tune bûn."

Pirsên ciwanan nediqediyan. Pirseke wiha jî, ji rehmetî kirin: "Apê Mûsa, tu jî çûr i (kej i). Ma qey di Kurdan de jî çûr hene?" Apê Mûsa keniya û wiha got: "Rojekê dîsa eskeran em girtin. Di nava wan de çawîşekî Laz hebû. Pirr bêhiş û bêmêjîbû. Bi kulm û refesan li min dida û bi zaravayê xwe yê Lazîtî digot: "Min çawayî te kiro, dişibe gawiran haaa..." Min jê re got: "Kurê min rast e. Ez weke Ewrûpiya me. Lî te qet li xwe mêze kiriye ku, ka tu dişibî ci?" Dema min jê re wilô got gelek hêrs bû, got: "Ha min çawayî te kiro, ka tu bibêje ez dişibîm ci?" Apê Mûsa digot: "Min jê re got: "Li qisûrê nenêre, lê tu naşibî tu tiştî jî. Tu her dişibî xwe. Bi rastî jî min heta iro mexlûqekî weke te ecêb û sosret nedîtiye. Her tu ne mirov i, lê ka tu ci yî, ez nizanim." Pişti ku min gotinê xwe xelas kirin, hevalîn wî hemû bi dengekî bilind keniyan. Ew jî di cihê xwe de mat ma. Serbazekî wan hebû, gotinê min li wî jî xweş hatin. Edî nehiş ku, ew hovê sosret têkilî min bibe. Em ji refesên wî kerî xelas bûn. De ka em ji qîlê van guran kengê xelas dibin.."

Belê bi hezaran rehmet li mamê me Mûsa û miyyîn me hemûyan be.

Ebas! Bi xwîna we xaka Kurdistanê hate avdan!

Wiha we xwe avêtin pêşîr û sînga çiyayê Serhedan, Şerefînê. Ew çiyayê ku ji hezaran salan ve bav û bapîrên me parastine û ew Kurd hiştîne, da ku ew çiya li pişt we bisekinin, di tengasiyê de, di şer û cengê de û di zilm û zorê de. Ta ku rojekê gulleyeke sor, xwîn bi laşê te yê nazik û teze de anî xwarê. Ne ku çiyayê Serhedan pîr bûbû. Û li pişt we nesekinî. Weke ku xiniz (xayîn) dibêjin! Belê ji ber ku noker û xiniz pirr bûne...

Pismam

Pismam, tiştekî me yî qenc di destê me de maye ku destê me jê nabe. Ew tişt ji ev e ku, destê me ji çiyayê me nabin. Heger destê me ji wan bûbuya, niha ji mêj ve em Kurd nemabûn. Vêca gava ku li me diqewime em xwe diavêjin per û bextê çiyayê xwe da ku me biparêzin... Da ku em Kurd bimînin.

Pismamê Ebas, bi rahiştina pêñûs û xameyê re wêneyê te li ber çavê min diçe û tê, bi gewdeyê têrgoşt, dêmén girover, awirêñ tûj, axaftin û şorêñ şîrîn.

Pismam, hengî tu bi xwe piştrast bûyî, te heybet û sawa xwe di dilê mirov de çedikir û çawa yekî wekî te wê ji xwe ne piştrast be.

Yekî wekî te ku bi vîn û e-vîna xwe canê xwe bi gorî xaka welatê xwe dike, ma ci ji vê mezintir heye û kî dikare vê yekê pêk bîne ji bili mirovîn mezintirîn di cihanê de?


Ebas, berî ku tu derbasî çiyayê xemgîn bibî, çend caran te riya xwe bi min dixist wê hengê ez û tu li ser gelek mijarêneteweyî diaxivîn. Ci dema ku tu ji ba min diçûyî, bêhtir te cihê xwe di dilê min de dihişt û bêhtir û bêhtir ez bi te diponijîm. Ta ku carekê min seh kir tu bi hevalen xwe re bi serê çiyayan ketiyî. Da ku hûn hebûna gelê xwe li wan hêlên bilind eşkere bikin û hûn bibêjin, "Em Kurd in... Em Kurd in..."

Wiha we xwe avêtin pêşîr û sînga çiyayê Serhedan, Şerefînê. Ew ci-

yayênu ji hezaran salan ve bav û bapîrên me parastine û ew Kurd hiştîne, da ku ew çiya li pişt we bisekinin, di tengasiyê de, di şer û cengê de û di zilm û zorê de. Ta ku rojekê gulleyeke sor, xwîn bi laşê te yê nazik û teze de anî xwarê. Ne ku çiyayê Serhedan pîr bûbû. Û li pişt we nesekinî. Weke ku xiniz (xayîn) dibêjin! Belê ji ber ku noker û xiniz pirr bûne...

Ebasê pismam, bi wê bîrînê re canê te hin bi hissist bû û gewrika dînyayê li ber çavê te bû mîna rewrewkê. Gelo di wî bîstikê de, di wê bîstika berî mirinê de ci dihat bîra te? Û ci li ber çavê te diçû dihat?

Gelo xwişka te "Xeco" bû ya ku wek te ji çend salan ve xwe li serê çiyan gitte, an pismamê te "Ferîd" bû, yê ku daye ser rî û şopa te, an hevalen te bûn ku bêsaloxdan in, em nizanî li ku ne? An dayîka te ya xemgîn bû; an bavê te yê dilovan bû, herdu bîrayen te yên cêwî "Tahir û Ezîz" bûn, xwişka te ya bîcûk "Mehabad" bû, an zaraken cînarê te yê ku dîwar bi dîwar ve û huner mendê bi nav û deng "Mihemed Şêxo" bûn... An...



Kerîm (Ebas) 1963-1993


Dibêje ku ew tev nebûn, ku di vê bîstikê de, bi tenê tu bi meraq bûy, ku tu xwe bi karwanê şehîdîn xaka Kurdistanê bigihînî, da ku mîzgîniya xêrê bidî wan û bibêji, "Bi xwîna me xaka Kurdistanê hate avdan û va ji nû ve piştî heftê (70) salî xaka Kurdistanê şîn dibe li serê çiyan û giran li newal û deştan û li bajar û gun dan fire fira agirê Newrozê li ba dibe, li ba dibe."

XACEPIRS

Çeperast: 1-Helbestvanekî Tirk ê bi nav û deng. Endamekî Partiya Komunist a Tirk bû. Tevî partiya xwe di bin bandora kemalîzmê de bû. Pirrahiya jiyana wî di zindanê de derbas bû, dû re reviya Sovyetê û li wir mir. Bi helbesten xwe di na va helbestvanen cihanê de ji xwedî cihekî bi rûmet e. Di wêne de tê dîtin 2-Eşq/ Di bin çakêt de tê lixwekirin/ Di notayê de dema seknê 3-Ling, pê/ Roj/ Erdê ku av diçe serê 4-Kincekî qalind/ Di pirtûkan de beşa naverokê 5-Pirtûkeke Ehmedî Xanî/ Cih/ Kar 6-Di anatomiya jîndaran de hucreyên hîmî/ Zemîn, ax 7-Kinivisîna hêza hevkar a leşkerî yê Amerika û dewletên Rojava 8-Ji bo leşkerên dagirker ên Tirk tê gotin/ Navekî mîran 9-Xwedîmalî 10-Navê rojekê/ A-jotin

Serejîr: 1-Veşarî, sir/ Notayek 2-Sazbûn/ Hêt 3-Strîyên gir/ Navê darekê 4-Înad/ Hacet 5-Di Soranî de 'jin'/ Cînavkeke işarkî 6-Umid/ Di edebiyatê de celebekî nîvîsinê 7-Di Tirkîya kevin de 'bajar'/ Wesaire/ Cephe 8-Navekî jinan/ Ewle 9-Kinnivisîna 'mîlîgram'/ Sembola Îrîdîümê 10-Di îskanbilan de 'yek' 11-Nîşasta 12-Notayek

Amadekar: Rasto Zilanî



BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

Çeperast: 1-Yaşar Kemal 2-Eşîret/ İbare 3-Zûrîn/ Olan 4-Dr/ Şîrmâr/ Ce 5-Aile/ Riyad 6-Endaze 7-Ez/ İman 8-Zagon/ Fa 9-İdare 10-Nûner/ Re
Serejîr: 1-Yezdan/ Zan 2-Âşûrî/ Ea 3-Şîr/ Lezgîn 4-Ârişen/ Ode 5-Renî/ Dînar 6-KT/ Rûam 7-Em/ Zafer 8-Mî/ Arena 9-Aborî 10-Lal 11-Racâ 12-Se ned

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li derive: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Li Tirkiyê: 385393

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevi kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul Tel: 513.34.33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercen abonetiyê:

	Li hundir	Li derive
3 meh	60.000	30 DM
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Xanimê... Xanimê, keça Simko, kurê Mîrza Beg. Mîrza Beg; mirovekî navdar bû. Mal û malbata wî di zemanê xwe de dewlemend bû. Li mintiqâ Omeriyan ew bi navê Berzan dihat nasîn. Bi dil û malê xwe ve, bi Berzanî re bû. Di nava civata xwe de nedîhişt ku, kes dev biavêje Berzanî. Berzanî ji bo Mîrza Beg, baz bû, pehlewan bû, bi tac û teylesan ewliyakî Xewda bû. Li serê çiyan bû. Mafê Kurd û Kurdistanê diparast.

Wext û zeman derbas bûn. Di sala 1975'an de, şerê Kurdistanâ Başûr hat sekînandin. Bi biryara Cezaîr, bi destenê çar dijminên kevneperest, êrişâ çekdarî felişî. Gava ku hereket felişî; Berzanî lê xist çû Amerikayê. Li vir çavê xwe girtin. Bav Mele Mistefa Berzanî çû, law Mesut Berzanî rabû.

Ên Berzanî, Telabanî peşmerge bûn. Ên Partiya Karikerê Kurdistanê gerîla bûn. Xanim di meraqa wan gerîlayan de bû. Digot: "Gelo ew çi mirov in!.. Xwezîka min carekê ew bidîtana.... Xwezîka min carekê çav bida çavê wan..." Xanimê gerîla nedîti-bûn. Şev û roj her tim bi Xanimê re bûn. Xanimê qizeke xwendevan bû. Li ser wan, rojname, kovar û pirtûk dixwendin. Gerîla, li ber çavê Xanimê hîn jî mezin dibûn.

Rojek ji rojê salê; gerîla hatin bajarê wan. Êrişike dijwar birin ser leşkerêne Tirkan.... Li qereqolên wan xistin. Malen polisan bombe kîrin. Mîna birûskê kişiyan. Xanimê bi tenê li derive bû. Dixwest ku wan hîn nêziktir bibîne. Gerîlayek ji gerîlayan bîrîndar bû. Xwe ji ser dîwar avêt. Ket hewşa mala Xanimê. Xanimê, ji derive dihat.

Evîna Xanimê



Gerîla li erdê çeka xwe rast kir;

– Xwe tev mede!...

Nêrî ku qîzek e. Xwîn ji canê wê diherikî. Ji ser hişê xwe çû. Xanimê baz da. Serê gerîla rakir. Bi destê wî girt. Hîna li heyatê bû. Gerîla li pişta xwe kir. Bire bodromê. Xanimê, der û dora xwe baş zanibû. Gerîla bi cih kir, çû derman anîn ji hundir. Zar û zêc, hemû ketibûn odayekê. Xanimê, birîna gerîla cebirand.

Çend roj wiha derbas bû. Leşkerêne Tirkan, êrişike me-

zin birin bi aliyeñ çiyan ve. Li nava bajêr, li çend mala gerîyan. Carekê jî hatin mala Xanimê. Xanimê fend li wan kir. Pîrika xwe anîbû bodromê. Gerîla di nav nivînê pîrika wê de bû. Xanimê çû bi ser leşkeran ve:

– Hûn şerm nakin ku rehetta pîrika min a reben xera dikin!...

Leşker, rev bi rev vegeryan. Pîrika Xanimê, destê xwe li ser serîn gerîla gerand:

– Rabe kurê min, rabe şêrê min.... Leşkerê Romê çû...

Xanimê keniya. Li gerîla nêrî. Gerîla jî keniya. Destê xwe avête çeka xwe.

– Edi bes e!.... Îşev dicim... Xanimê, dengê xwe nekir. Pîrika wê:

– Na kurê min na!.... Hîna birînen te baş nebûne....

– Ez xwe bigihînim hevalen xwe tiştekî min namîne... Niha min mirî dizanîn, divê ez wan ji xwe haydar bikim.

Gerîla, gihişt hevalen xwe. Lê belê nizanibû ku, Xanim li şopa wî dimeşe. Gava, gerîla xwe gihiştand hevalen xwe;

Xanimê jî deng da!

– Hevalino.... Gerîlanoo-o.... Ez jî hatim!.... Serdarê gerîla, sekinî:

– Tu kî yî, çawa hatî vir?

Gerîla, bi hev re kenian û dengê xwe rakirin....

– Xanimê.... Xanimê êrişî ser gerîla kir, destê xwe avêt keviran.

– Hûn çîma dikenin? Ezê bi van keviran serê we bişkînim... Nerevin.... Nerevin!...

Gerîlayê birîndar, rewşa xwe û ya Xanimê diyar kîr.... Serdarê gerîla, bi dilxweşî keniya:

– Tu qîzeke wiha jîr î ha-a...

– Li gorî xwe me!...

– Xanimê, rewşa me pirzor e. Tu dê debar bikî? Tu qîzeke bajarî yî.

– Biceribîn!.... Fersendê bidine min. Min pirzor nivîs der heqê we de xwendine.

– Mesela.... Navê pirtûkekê bibêje.

– Ez ji kur zanim navê wan bibêjim... Hemû bi Tirkî bûn.

– Bi Tirkî bibêje.

– Kadin û Aîle Sorunu. (Pirsgirêka malbatê û jinê)

– Ma ew çi ye? Herkesi ew xwendiyel!... Ji çekan re çawan i?


Xanimê li dora xwe nêrî. Ji destê gerîlayekî stand; û nîşan girt. Serdarê gerîla:

– Temam... Bernede... Me te qebûl kir. Tu dîn î, tu har î...

Xanimê, dengê xwe bilind kir:

– Ez ne dîn im, ne jî har im. Ez evîndarê gerîla bûm. Min gerîla dîtin. Evîn û benigna min hîn zedetir bû. Ezê bibim gerîla. Ezê bibim Xanimâ serê çiyan... Nebim pe-pûka bajaran...

Sükrü Gülmüş



Gurê Boz

Dema bîharê bû, zevî û banî tev hêşîn bûbûn, bîhara renîn li her derî şax û kok dabû. Komek şivan keriyeke pez di deşte de diçêrandin. Jiyê wan pirr bi şayî derbas dibû. Lî derd û kuleke wan hebû ew jî Gurê Boz bû. Gurê Boz her şev êrişê pezê wan dikir û yet ji pezên wan ji xwe re dibr û dixwar.

Tivinga wan hebû, gopalê wan hebû lê nikaribûn tiştekî li hemberî Gurê Boz bikin.

Rojek ji rojan, berî êvarê, serê şivanan hevalen xwe tev kom kir û ji wan re got: "Lawê min, ev tiş şerm e. Her şev gur pezê me dixwe,

divê em tiştekî bikin. Ji ber vê yekê em işev ranezen, pawantî (nobedarî) li pez xwe bikin." Roj çû ava, bû şev, şivan ketin govendê, bilûrvanê wan bilûra xwe deranî û li bilûra xwe xist. Yek ji koma şivanan ku pawantî li keriye pez dikir, ji nişka ve tiştekî pirr xerîb dît û li cihê xwe şaş ma. Li aliye keriye pezê wan, li aliye din Gurê Boz li gel dengê bilûra bilûrvan sema dike û ew jî go-vendê digire.

Lawê şivan hêdî hêdî ber bi Gurê Boz ve çû, bi dizî ve kulavê xwe avête ser pişta gur û ew girt. Pişti hengê deng li hevalen xwe kir, şî-

van tev kom bûn û bi gopalan welgeran (lêdan) Gurê Boz. Dilê şivanan bi girtina Gurê Boz zehf şâ bû, wê

şevê heta sibehê bi şahî û bi çepik borandin. Serê sibehê zû gur şandin baxçeyê heywanan. Edî bila Gurê Boz li

wê derê bi şev û roj go-vendê bigire lê tu carî din pezê xelkê nedize.

Niwa Hebîb

Asûrî: Xwediye kji yên Mezopotamyayê

Seyît Ciya

Dîroka Asûriyan li Mezopotamyayê, 4000 sal Berî Zayına İsa (B.Z) dest pê dike. Li Mezopotamyayê di nava tixûbên Akad, Sumer, Babil û Asûrê de jiyan e û jêzaya van şaristaniyan yek e. Hemû ji nîjada Semîtik in.

Hikumdariya wan a yekemîn li Sumêrê dest pê dike û gav bi gav li hemû Mezopotamyayê belav dibe.

Hikumdariya wan pişti Sumerê, li sîteya Akad, Babil û Asûr dom dike. Çand û şaristaniya van gelan hemû yek bû. Gelên van sîteyan hemû zaraken Mezopotamyayê û Asûr bûne. Şaristaniya bi navê Asûr, ji hemûyan zêdetir ajotîye.

Babil, di sala (B.Z) 539'an de, bi êrişa Persiyan xera bûye. Pişti vê dîrokê her çiqas, car bi caran serhildanen Asûriyan cedîbin jî, bi ser nakevin û ji bo wan, rojê bindestiyê dest pê dikin.

LİSTIKÊN BÎZANS Û BELAVBÛNA ASÛRIYAN

Îskenderê Mezin (B.Z) di sala 333'yan de Mezopotamyaya Jorîn ji Persiyan distîne. Heta wê demê, ev gel bi navê "Asûrî" tê naskirin. Lê, di alfabeşa Yewnaniyan de típa "Ş" tune. Ji ber vê yekê, pişti vê demê wek "Asûrî" tên binavkirin. Ev nav jî, di pêvajoyê de pêşî dibe "Asîryan", dawî bi şeklê "Suryanî" diquhere. Dizimanê nivîsandina wan de, heتا niha ji Suryanî, bi navê "E-soryoye" tên binavkirin.


Pişti ku Îsa derdikeve dika dîrokê, Asûrî ku di bin hikumdariya Roma û Persiyan de bûn, ola filehîtiyê dipejîrinin.

Asûriyên Mezopotamyaya Jêrîn û Jorîn hemû, pişti pejrandina filehîtiyê, navê dêra xwe datînin 'Dêra Suryanî'.

Pirr bi ser ve naçe, İmparatoriya Romayê ji yekîtiya oli ya Asûriyan agahdar dibe. Ew, ji vê yekîtiyê ne xweş in. Li gor wan, ev yekîtiya oli, di pêş de wê kare yekîtiya neteweyî ji ava bike û bibe sebebê vegetandina Asûriyan ji împaratoriye. Dêra Asûriyan jî, li hember Papatîye berfireh dibû û ji Bîzansiyârîn cuda, rêxistina xwe ava dikir.

Di rastiyê de Asûrî bi armanca yekîtiya neteweyî li dora Dêra Asûrî bûbûne yek.

Pişti ku İmparatoriya Ro-



Di wêneyê de Dêra Saint Josephe tê dîlin.

navê Suryanî-Marûnî tê naskirin. Dîsa di van salan de hinex Nastûrî bi Papa ve tên girêdan û bi navê Babil-Kildanî tê naskirin. Asûrî bi vê yekê jî parce dîbin.

Nastûrî li Mezopotamyaya Jorîn, Behdînan û Cûlemêrg, Yaqûbî jî, li Mêrdîn, Amed, Nisêbîn û Ruha dijîn.

Asûriyên ku, ji pîkoliya Pers û Bîzansiyân bêzar dîbin di sed-sala 7'an de xwe dispêrin Erebên misilman û axa xwe ji wan re vedikin. Bi vî awayî, ji pîkoliyan (pêkutiyâ) xwe hinex diparêzin.

Dîsa di wê demê de Qebile-ya Kenanî, ku milek ji Asûriyan e, ji bo bazırganiyê koç dike û diçe Hîndistanê û li wir dimîne. Dema ku Kenanî dicin Hîndistanê, ola filehî li wir belav dibe, Niha li Hîndistanê hejmara wan nêzîkî nîv milyonî ye.

Ew Erebên ku ketibûn axa Asûriyan, bi peymana ku dê dostanî biajon û xerabî nekin, hatibûn.

Asûrî wê demê li ser rewşa çand û şaristaniyê, zanistî, ze-neat û bazırganiyê dixebeitin.

Li Nisêbînê (Kennisîrîn), li Mêrdînê (Dêr-ul Zaferan) û li Ruhayê (Herran) zanîngeh û a-

kademîyan ava dikin.

OSMANI: BEXTREŞÎ Û QIRKIRIN

Xurtbûn û belavbûna Osmaniyan, ji hemû gelên Rojhilatê re bû bextreşîyeke mezin. Bi hatina Osmaniyan re, di vê herêmê de dîsa şer û bela dest pê kir. İmparatoriya Osmani her ku axa Mezopotamyayê bi dest xist, di nav ol û gelan de tovîn neyartiyê çand. Şerê ku di navbera wan, Ereb û Farisan de derdiket, axa Kurdistanê -ku welatê pirr gelan bû- dida ber xwe.

Osmaniyan destûr dida mîsyonerên Fileh ên Ewrûpayê ku, di nava Asûriyan de bixebitîn û di nava wan de mezhebîn nû biafirîn û wan car din parce bikin. Ji bo vê destûr jî, ji Ewrûpayê alîkarî distandin. Ew mîsyonerên ku bi navê dosta-nîyê hatin Mezopotamyayê, mezhebê Protestanî û Katolîki jî di nava Asûriyan de belav kirin û wan hinekî din jî, ji hev xistin.

Sal û sed salên Asûriya wiha derbas bû. Di dawiya sedsala 19'an de li nava hemû gelên dînyayê û di nava Asûriyan de ramanîn welatparêzî belav

bûn.

Cend xorten nîştimanperwer ên Asûrî, Naim Faîq, Aşûr Yûsif û Senherib Balê, bi navê "Stîrka Mezopotamyayê" kovarek derxistin. Di wê demê de, bi navê "Riya azadî" ji kovarek derdiket. Ev kovar bi zimanê Suryanî, Kurdî û Tirkî, lê bi alfabeşa Suryanî dihatin weşandin.

Ev tevgerên nîştimanperwer ên di nava qoloniyan de, bala Osmaniyan zû kişand. Ermenî, Kurd û Asûrî xeyala azadî û serxwebûnê dikirin. Asûrî û Ermenî di Şerê Cihanê ya Yekemîn de alîkarî bi Rûs û İngilizan re kiribûn. Li gor wan, pişti binketina Osmaniyan, wê mafêن xwe yên neteweyî bistandina.

Osmanî, di pêvajoya şer de, car din dest avêtin olê. Şêx, beg û kevneperestenê Kurd kişandin ba xwe û wan li dijî Ermenî û Asûriyan fit kirin; Di navbera salên 1914 û 1919'an de axa Cûlemêrg, Mêrdîn, Ruha, Amed û Sêrtê bi xwîna deh hezaran Ermenî û Suryanî hatin avdan. Bi deh hezaran fileh jî, koçkirin Rûsya, Filistîn, İran, Suriye û Hîndistanê.

We bidome

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.